

**D**i warê huqûqî, têkiliyên navneteweyî û di warê dîplomasiyê de Tîrkiye dikeve nav tengasiyeyekê. Hemû hêza xwe rakirîye ser piyan ku dengê kurdan bibire û yekîtiyên wan ji hev belawela bike. Ji bo ku bikaribe vê yekê bike û alîkariya dewletên cihanê bistîne, tawîzên mezin dane û xwe firotine gelek weletên cihanê!

Rûsya pêşketinên li welêt ji nêzîk ve dişopîne. Li parlamentoya Rûsyayê problema kurdan gelek caran hate nîqaşkirin. Heya civîna PKDW'ê li parlamentoya Rûsyayê hate lidarxistin. Van dawîyan protokoleke pir gir girîng di nav kurdan û Rûsyayê de hate îmzekirin. Ev protokol û xalên vê protokolê, wê di dema pêşiya me de bêne daxuyandin.



Hejira pêşîrê ERNK'ê  
Malmî Weelat û çêniyê gund

## Rastiya gundê kurdan

- **DÜZGÜN DENİZ di bin sernavê "Derowên dewletê têk çûn" de, li ser bûyera Licê û kirinên dewletê, radiweste** Rûpel 3
- **CEMŞİD BENDER li ser entelektueliya kurdî nivîsî: "Pirsgirêka entelektueliya kurdî"** Rûpel 10
- **Bîreweriya şehîdekî û serboriya gerîla nivîsa ŞERVAN AHMET bi sernavê "Girê Gêrsin warê Egîr-bû"** Rûpel 6
- **LERZAN JANDÎL li ser adet û toreyên kurdan ên pîrozkirina sersalê radiweste: "Sera şîma wa newiyê pîroz bo"** Rûpel 11



NAVEROK



4

Xendal Astore: Gelê ku dîroka wî nehatiye nivîsîn (2)



7

Eşref Sîdar: Konsera Dengbêj Seyda û girîngiya çanda devkî



11

Azad Altun: Mala çandê ya jinên kurd

Ji Xwendevanan

Ji bûyera Susurlukê û vir de çapemeniya (TC) dibêje. Ji niha û pê ve li KT'ê nema her tişt wekî berê didome" Tu dibêji qey berê çapemenî ne di destê wan de bû, televîzyon ne di destê wan de bû, haya wan ji tu tiştî tune bû.

Gerek mirov bi peyvên wan tu car nexape, çapemeniyeke di bin bandora ramana fermî de wê çiqas xwe azad bike û azad bifikire. Ramana fermî ji xwe re kiribe terzeke jiyane, wê çiqas di jiyana xwe de azad be? Tovên nijadperestiyê, tovên kemalîzmê, tovên olperestiyê bûn naveroka rojname û televîzyonên wan, berjewendiyên xwe wekî berjewendiyên gelê didin xuyakirin. Ji-yana xwe ya bûrjûva wekî ku jiyana me be, didin xuyakirin.

Bûroya rojnameya Özgür Ülkeyê hate bombekirin û rojname hatin girtin. Rojnamevan, parlamenter, rewşenbîr, gundî hatin kuştin, gund hatin valakirin, qet pênûs nelivand. Çapemeniya tirk, bûye berdevkê ramana fermî bi meaş.

Çapemeniya tirk, heger li dijî ramana fermî şer bike, ancax wê hingê dikare azad bibe û civateke pak pêk bîne. Ev ji ne gengaz e. Ne ji şoreşa rizgariya neteweyî be, tu car civateke pak, civateke serbixwe, çênabe.

FİKRET ARDA



Şerê qirêjî qedera civaka tirk jî diyar dike

SAMÎ TAN

Civaka tirk ji her alî ve dirize, binêrin li bûyer û qewimînin hefteyekê. Rayedarên tirk ji bo ku bûyera Susurlukê ji rojevê derxin çî ji destê wan tê dikin. Serê pêşin rêberê Aczimendiyan Müslüm Gündüz hate girtin, hemû rojname û televîzyonên tirk giraniya xwe dan ser vê bûyerê. Giş bûn parêzvanê namûsa Fadime Şahin. Ji bo çapemeniya tirk tiştê girîng ne namûs û nelirêbûna hinek terîqatan bû, sedema gir û kîna wan muxalîfiya vê terîqatê bû. Ji ber ku ew li dijî kemalîzmê bûn diviyabû bihatine riswakirin. Ev bûyer ji bo çete û serokçeteyan jî derkefek bû.

Li dû vê bûyerê Tansu Çillerê baloneke din teqand "Mahmut Duyarê ku Özdemir Sabancı kuştîye hate girtin." Lê derket holê ku ew kes bi xwe teslîm bûye û navê wî Mustafa Duyar e. Daxuyaniyên li ser vê yekê têvel bûn, lê ya herî komik a Wezîra Karê Hundirîn Meral Akşenerê bû "Polîsên me ew gelekî tengav kirine ji ber vê yekê mecbûr maye ku xwe bispêre bal-yozxaneyê me ya Şamê." Her kanaleke televîzyonê ji polîsekî îfadeya Duyar stand û weşand. Rayedarên dewletê dîtîn

ku ev bûyer bi serê xwe têrê nakin, îcar cendekê Vehbi Koç ê ku hatibû dizîn, bi dest xistin.

Hem ev bûyer û hem jî tiştên ku bincil-kirina wan tê xwestin rizîna civaka tirk nîşan didin. Ev bûyer didin zanîn ku ne tenê lîberal û muhafazekarên tirkan, oldar û heta çepgirên wan jî dirizin.

Medya tirk a ku serkêşiya kampanyaya "civaka paqij" dike, ji hemûyan lewîttir e. Ji bo vê yekê jî nimûne gelek in. Lê ez dixwazim li vir qala du mînakên bikim. Yekemîn rojnameya Turkish Daily News e. Ev rojname xwe rastgo û lîberal nîşan dide, qaşo agahiyên rast dide kesên ku bi zîmanê îngilîzî dixwînin. Lê bi zanatî ji bo berjewendiyên dewletê derewan dike. Her kes dizane ku bûyera Basayê hêzên dewletê pêk anî, ji gelek saziyên demokratîk û aşîxwaz heyet çû cihê bûyerê, bi şahidan re hevdiştin pêk anî. Lêzîmên kesên ku hatine kuştin bûyer kitekit vegotin, heta serî li Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê jî dan, lê li gorî vê rojnameyê 11 gundî ji aliyê PKK'ê ve hatine şewitandin. Dîsa li gorî vê rojnameyê mamoste-

yên Maraşê û Hantepeyê jî PKK'iyên kuştine, bi şahid û îspat tê zanîn ku mamoste ji bi destê kontr-gerîla hatin kuştin. Lê ji bo rastgoyên lîberalên tirk xem nake, berjewendiyên dewlekê wisa difermin.

Mînakek jî ji rojnameya Radikalê, nivîskarê vê rojnameyê İsmet Berkan di nivîsa xwe ya 7'ê rêbendana 1997'an de li ser qaşo operasyona artêşa tirk a Başûr di-sekine. Ji nivîsê tê fêmkirin ku haya Berkan ji rastiya bûyerê heye, lewre ew jî dipêjirîne ku li holê operasyon tune, lê êrîşa gerîla heye. Hêzêke mezin a gerîla (450 kes) avêtiye ser Qereqola Siyahkaya, êrîşê 12 demjimêran dewam kiriye, lê tiştê sosret hêzên taqwiye hatine ji hêzên gerîla 150 heb kuştine. İcar ev e radikalê Aydın Doğan, bi rastî di warê derewan de ji wî radîkaltir nîn in.

Xuya ye ku hemû kesên di nav karên kirêt de li Kurdistanê digihîjin hev, lewre kana kirêtiyê şer e qirêjî ye. Sûcdar ji bo sûcê xwe veşêrin, xwe dispêrin şer. Dema yek dibêje "te ew karê pîs kiriye", hema di cih de dibêjin "min li dijî PKK'ê şer kiriye." Her wekî rayedarê İHD'ya Amedê Vedat Çetin dibêje li aliyekî qala "civaka paqij" tê kirin, li aliyê din, hovitiyên bi her cureyî li Kurdistanê dom dikin, bi vî awayî paqijî çênabe. Wisa xuya ye ku civaka tirk wê bi helwesta xwe ya li dijî şer, qedera xwe jî diyar bike.

Demokrasiya di rê de

CAN DILBİRİN

Belê, her kes dibêjin em li benda demokrasiyê ne. Lê yeke çawa gelo? Kesek bersiva vê pirsê rastî nabêje, ji ber ku ji mêj ve navekî taybetî li Tirkîyeyê heye; kuştin û înfazkirina mirovên ku mafê xwe dixwazin û pirsê demokrasiyê dikin. Dema ku min dest bi xwendinê kir, mamosteyên dibistanê ev digotin: "Demokrasi wê bê û emê jiyanê xweş bibînin. Bi rastî me pir meraq dikir, ev kes çawa ye? Ewê ku navê wî ew qas li dinyayê belavbûyî. Demirel û gelek hevalbendên wî yên mîna İsmet û mebûsê partiya wî wekî Baki Tuğ û hwd. digotin di nav dewletên Rojhilata Navîn de ji hêla demokrasiyê ve Tirkîye yekemîn cih distîne. Rast e, ji hêla kuştin û qirkirina kurdan ve yekemîn tê hilbijartin. Berî çend rojan di televîzyona ATV'ê de nûçevanê wan wiha digotin: "Serokê Amerîkayê birêz Clinton nameyek ji senatoya Amerîkayê re bi rê kiriyê, di nameya xwe de dibêje ku dewleta tirk di nava çend dewletan de di warê xurtbûna mafayê de yekemîn e." Belê, ev gotin pir rast e, lê tirkan ev yek çima heta niha nedidistin? Baş e wext hatiye ku mirov ji bo aştîyê xebatê bike û bimeşe. Bes e, êdlî, divê mirov reş û spî ji hev biqetîne. Bi salan e ku şerê qirêjî li Kurdistanê didin meşandin siyasethanên tirk û dijminê mirovatiyê, vî şerê ha bi çî didin meşandin û çawa didin meşandin? Divê hemû tirk û kurdên ku di van rojan de, wî dizê ku heta niha dizi-

Divê ew daxwaza malbatan bibe bingehê aştîyê ji gelê kurd û tirk re. Bila destê xwe bidin hev, eger biratiyê dixwazin. Ji ber ku kesên çavsor û diz destên xwe dirêjî xwêdana eniya me û keda destê me jî dikin.

ya wan dikir, bibînin. Binêrin çend kesên ku Çiller wan bi qehremanî dide xuyakirin, yek ji wan jî, mebûsê partiya wê ye û serokê çahşan e, qatîlê mirovan e û xayinê mîletê xwe ye.

Berî demekê çend malbatên tirk ku zarokên wan li Kurdistanê di nava wî şerê qirêjî de dîl ketibûn destê gerilayên ARGK'ê, bê çiqasî daxwaza wan azadiya leşkeran be jî, divê ew daxwaza malbatan bibe bingehê aştîyê ji gelê kurd û tirk re. Bila destê xwe bidin hev, eger biratiyê dixwazin. Ji ber ku kesên çavsor û diz destên xwe dirêjî xwêdana eniya me û keda destê me jî dikin. Ev ne bes e welatê me yî xweş î wekî bihuştê kirine rawestgeha mafya û hêlîna dizan. Bi alîkariya wan vî şerê li Kurdistanê didin meşandin. Tiştêkî herî balkêş heye di rojevê de, çî ye gelo? Demokrasiya li Tirkîyê di bin kincên leşkeran de ye. Ango demokrasiya ku mirov jê re dibêjin mafê mafya, heye.

Ew kesên ku ji mirov û mirovatiyê hez dikin di nava hikûmeta tirk de mirov dikare bi tiliyan nîşan bide. Ji ber ku miriyên nav saxan e, hiş û mējiyê wan, kar û xebata wan dizî û talankirina keda destên aşîxwaz û karkeran e. Eger ne wisa ye çima kesên ku dibêjin em mafê azadiya xwe dixwazin wan bi navê terorîst bi nav dikin? Gelo ew navê xwe baş

dinasin ku mirov ji wan bipirse, navê we çî ye? Bila ewên ku dibêjin demokrasi li Tirkîyê heye, biçin ber neynikê û baş li xwe-binêrin, xwe nas bikin. An bila bèn di neynika me de derkevin pêşiya gelên demokrat, ka kesên xwedî mafê mirov wê çî bibêjin, ji wan re. Ew neynika ku mirov xwe tê de bibîne çî ye gelo?

Ev çend roj in bi qezayeke wekî ku berê tiştêkî wisa li Tirkîyeyê nebûyî, hinek kes dixwazin bidin xuyakirin. Hişyarbûna gelê kurd, gelê tirk jî, hêdî hêdî ji xew hişyar dike. Wekî di serî de-jî, me got diz hene, talanker hene.

Berî bi bîst salan şoreşvanên kurd wiha digotin: "Bê çiqas xayin, xwefiroş û dagirker hebin di Kurdistan û Tirkîyeyê de xwe li ber vê hêzê nagirin, wê bihelin û wê derkevin ser rûyê erdê." Ne demokrasiya li ser kaxiz û ne jî mafê mirovatiya ewrûpiyan jî, êdî nikarin serê xwe li hemberî şoreşa ku ji bo demokrasiyê paqij û rast e, bidin sekinandin. Navê demokrasiya li Tirkîyeyê, faşîzm û diktatorî ye, kuştin û şewitandina kurdan e. Demokrasiya MHP'ê û mafayê ye. Li dijî şoreşa kurdan kî çî bike di çavê dewleta tirk de ew qehreman e wekî Sedat Edip Bucak, Serxweş Kemal, Tahir Axa û gelek kesên din. Lê şoforê kamyonê qehremanê herî mezin e.





**CİGİRÊ** Serokê Şaxa Şerê Taybet (Özel harb dairesi) İbrahim Şahin da zanîn biryara kuştina karsazên kurd ji aliyê girêgirên dewletê ve hatiye dayîn. Şahin roja 7'ê rêbendana 1997'an ji bo îfadeyê derket hemberî Komîsyona Susurlukê ya TBMM'yê.

İbrahim Şahin li ser pirsra eleqeya wî bi kuştina Behçet Cantürk û Savaş Buldan re got: "Standina biryara kuştina Cantürk û Buldan ji aliyê me ve ne mimkûn e. Em bi serê xwe nikarin biryareke wisa bistînin. Wan PKK'ê ji aliyê aborî ve fînanse dikirin. Bi rastî ez bi kuştina wan kefxweş bûm."



**NÛÇEVANÊ** rojnameya Evrenselê Metin Göktepe roja 7'ê rêbendana hate bibiranîn. Gelek hevalên Metin û hin malbata wî di vê çalakiya bîranînê de cih girtin. Peşî de malbat û hevalên wî çûn li ber salona Eyûpê rêzgirtin û Mîdurê Emniyeta Stenbolê yê berê Orhan Taşanlar hate tawanbarkirin. Helwesta dadgehan jî hate rexnekirin. Metin Göktepe di 8'ê rêbendana 1996'an de dema merasîma definkirina girtiyên ku hatibûn kuştin dişopand hate binçavkirin û li Salona Sporê ya navçeya Eyûpê bi destê polîsan hate kuştin. Ev salek e ku kujerên wî bi serbestî digerin.

## NÛÇE

# Derewên fermî têk çûn



**Li ser vê helwestê Vedat Çetin "Ev şerxwazî ye. Hê jî wafî dibêje gelê Licê bi dilê xwe bûye cerdevan. Em ji çavên xwe bawer bikin, an ji gotinên wafî?" Eren Keskin "Min heta nika psikolojiya leşker û subayan qet ewqas bêhêvî nedîtibû." dibêje û dide zanîn ku ne tenê gel, karmendên dewletê jî ji şer zirarê dibînin.**

(hesasiyeta) raya giştî xwestin. Wekî din ji wekilên meclisê re gazî kirin ku ji bo avakirina heyeta Licê alîkariyê bikin.

Hemû biryar li ser fikr û ramanên îtîrafkar Engin Karadağ tînin girtin. Di wan rojan de ambargoya xwarinê jî dest pê dike. Dibêjin divê hûn bi karmendên xwarinê xwe bistînin. Ji yê ku kirine cerdevan re jî alîkariyê dikin; lê malbatên cerdevanan ve alîkariyê napejirînin û dibêjin "Em birçitiyê tercîhî bêrûmetiyê dikin."

Saziyên demokratîk di nav hev de heyeteke wekî platform amade dikin û ji Enqere û Stenbolê jî hin kes beşdarî heyetê dibin û diherin ku serî li Waliyê Herêma Rewşa Awarte (OHAL) bidin, lê berrîseki nabînin ku jê destûrê bistînin. Li ser vê yekê biryar tê girtin ku heyet bikeve rê û here Licê.

### Heyet di rîya Licê de

Li Qereqola Mermer rîya heyetê tînin. Jê re tînin ku heta ew destûra wafî û destûra "Ofîsa çapemenî û tîkiliya gel a herêma" nestînin îmkana çûbûna Licê nîn e. Li ser vê helwestê heyet bi telefonê li wafî digere. Wafî dibêje "berdin". Der barê vê tewra erênî de rêvebirê İHD 'ya Amedê Vedat Çetin û Eren Keskin wekî hev difikirin û dibêjin "Wafî hêvî nedikir ku gelê Licê wê rewşa xwe bi vî rengî bîne ziman. Bi ya me Qumandar Hacı İbbaş garantiya xwe da wafî û ev bawerî li ser wafî çêbû."

Keskin dibêje: "Gava ku em ketin Navçeyê min wisa zanî ku tu kes li vir

tune ye. Hemû mal û xanî an hatine şewitandin an jî ji ber bîrê tîngan diwarên malan bûne mîna bêjîngan. İnsan tunebûn xeynî zarokêkî. Eskotrên me yê fermî em birin pêşiya qonaxa hikûmatê. (Gava ku heyet digihîje wir Hacı İbbaş bi kincên sîvîl tî cema heyetê) me dît ku di navbera du deqeyan de derdora me tîjî jin, kal, pîr û zarok bû. Ji heyetê re digotin: "Çi dibe bi xêra xwe re zarok û camêrên me ji cerdevantiyê xelas bikin. Em cerdevantiyê naxwazin, ên ku pejirandine ji ber tîrs û neçariyê qebû kirine. Tu kesî bi dilê xwe çek nestandî ye. Ev bi darê zorê ye."

Li ser vê yekê heyet jî İbbaş re dibêje "Ev bê zagonî ye. Hûn çima bi darê zorê tiştên ku gel bi îradeya xwe napejirîne, pê didin kirin?"

İbbaş îdia dike ku ev rast e, her kesî bi dilê xwe çek girtiye û li ser tu kesî zor tune. Ew gotina xwe wiha didomîne: "Ku hûn bawer nakin bi çave xwe bibînin."

Piştî vê gotinê kesên ku di tabûrê de bûn tînin ba heyetê û İbbaş bang li wan dike: "Hûn bidilê xwe bûne cerdevan ne wisa?"

### Gel derewan pûç dike

Gel diyar kir ku ev ne rast e û bi hev re, "Em naxwazin ku ji malbata me kesek çek bigire, bibe cerdevan." dibêjin. Li gorî Keskin yê ku ji tabûrê hatibûn jî serê xwe xistine ber xwe û tiştêk negotin. Lê ji van hin kes bi dizî kaxizan dînavîsin ku ji ber zorê ev rewş qebûl kirine. Heyet li ser vê bersivê jî aliyê polîsên



sîvîl ve tînin kutandin (ji polîsan lîdanê dixwin). Polîs bi taybetî erîşê dibin ser Sekreterê KESK'ê Faysal Özçift. Heyet ve erîşê protesto dike. Heyet ji bajêr derdikeve, tî Amedê.

Heyet rapora xwe amade dike û belav dike. Di raporê de diyar dikin ku ev tewra dewletê ye û tiştên ku di çapemenî de derketine hemû rast in, heta kêman jî. Licê di bin cerdeke mezin de ye; birçitiyê li wir jiyana mirovan tehdît dike. Telefona nê gel tî guhdarîkirin û ew her tim di bin tîrsa kuştinê de ne. İdiayên dewletê hemû derew in. Mebest ne parastina kaxane û fabrikayên Halis Toprak e.

Li ser vê tewrê Vedat Çetin "Ev şerxwazî ye. Hê jî wafî dibêje gelê Licê bi dilê xwe bûye cerdevan. Em ji çavên xwe bawer bikin, an ji gotinên wafî?" Eren Keskin "Min heta nika leşker û subayan qet ewqas bêhêvî nedîtibûn." dibêje û dide zanîn ku ne tenê gel, karmendên dewletê jî ji şer zirarê dibînin.

Li ser raporê, di meclisê de lêgerîna bûyerê hate xwestin. Li aliyê din jî aşîxwaz û rewşenbîrên tirk heyeteke din hate damezrandin û roja çarşemê (08.01.1997) ew çûn Amedê. Li gorî agahiya ku Şanar Yurdatapan daye me, digel wî bi xwe, Akın Birdal, Orhan Pamuk, Celal Başlangıç, Savaş Ay, Ertuğrul Kürkçü, Nadire Mater û hin kesên din di nava vê heyetê de cih girtine.

Eren Keskin û Vedat Çetin politikaya dewletê ya cerdevaniyê jî rexne dikin û diyar dikin ku bûyerên li Licê jî nîşan dane ku dewletê xwe xistiye kûmpaseke mezin û xwe ji hin tiştan bi hêsanî nikare xelas bike. Ji aliyekî ve dibêjin cerdevanî jî rê derketiye, wê bê rakirin, ji aliyê din ve jî cerdevantiyê jî gel re dikin mecbûriyet.

Ev jî şerê di navbera çeteyên dewletê de eşkere dike.

DÜZGÜN DENİZ

**N**iha şerê kirêt ne tenê li serê gaz û çiyana e. Piştî ku gund xelas bûn, vê carê jî dest bi şewitandin û valakirina navçe û bajarên kirin. Ji sala 1993'yan heta îro hemû gundên Licê an hatine valakirin û şewitandine. Îro jî 67 gundên Licê niha yek jî şên nemaye.

Di 10'ê meha berfanbara 1996'an de li navçeya Amedê Licê hate îlankirin ku gere gelê navçeyê çekan hilgire û dest bi cerdevantiyê bike. Hate gotin ku heke gel ve nepejirîne ewê navçeyê bi tevahî bidin ber bîrkan. Wan got: "Aha ji wê re 10 roj muhlet."

Qeymeqam Akgün Corav, ji nişka ve di 13-14 meha beranbarê de bi lez û bez raporê distîne û dihere. Ew wekaleta xwe jî arasteyî Yüzbaşı Hacı İbbaş dike. İbbaş gelek gefan li gel dixwe. Di şeva 20 mehê de kurin û hawar, zêwî, ziwatîrî dikevin nav hev û du. Leşker, polîs û timên taybet dikevin sûk û kuçeyên navçeyê, ji malan çî xort û camêr hene hemû derdixînin û li ber qonaxa hikûmatê dicivînin. Jin û zarok li pey wan tînin li dora qonaxê dicivînin. Qumandar Hacı İbbaş dibêje niha kî hate hilbijartin, gere ev çek bistine û bibe cerdevan. Dû re dest bi hilbijartinê dike, di pêşî de kesên pîr û yê ku di karê dewletê de dixebitin berdide. Paşê 84 kesî vediqetînin û yê din dişînin malê.

Lê kes ve napejirîne jî saziyên demokratîk ên Amedê alîkariyê dixwazin.

Heta heyet ava dibe, hefteyek derbas dibe û kesên ku neqandin di wê hefteyê de li ber tabûrê di banga sibê de heta mixurba êvarê perwerdehiya cerdevaniyê dibînin. Wan êvarî jî ji tabûrê bernadin. Nûçeyên li ser Licê di çapemeniyê de cih girtin. Cigirê Serokê İHD'yê, Parêzer Eren Keskin, Sekreterê HADEP'a Stenbolê Cemal Coşgun û Pr. Tarık Ziya Ekinci li ser vê mijarê pêjinkariya





Gelê ku dîroka wî nehatiye nivîsîn (2)

# Dîrok divê ji şaxên din ên zanistê sûdê wergire

XENDAL ASTARE

Lêkolînerên folklorê yên ku diyalektîk-materyalîzmê ji xwe re dikin rêber, her tim vê ramanê derdixin pêş; tiştê girîng di pîvana hêjahiya tiştêkî ku hatiye afirandin de, ne kesê ku ew afirandiye, yan jî cihê ku ew lê hatiye afirandin e, girîng û giraniya wî tiştî ya ji bo mirovahiyê ye.

Dema mirov giraniya lêkolîna xwe bide ser herêmekê, bivê nevê mirov dê bikeve dafika herêmparêziyê. Wê çaxê mirov teng difikire, ji mirov kirî ku ji bilî vê herêmê li tu cihî tiştêk nehatiye afirandin. Dema mirov tiştê ku li herêmekê hatiye afirandin nede ber yên ku li herêmên din hatiye afirandin, mirov ji rastiye dîr dikeve. Hema mirov ji nişka ve ji diwerqile ku mirov bingeha folklorê neteweyî avêtiye, ew jî ji neteweperestan re dibe malzeme.

Dibe ku di destpêkê de armanç ne ew be jî. Armanca bi belgekirina şaristaniya vê herêmê ye û bi riya vê xebatê jî ronîkirina perisîna şaristaniya mirovahiyê ye, bes piştî demekê mirov ji vê armançê avarê dibe. Sedema vê yekê jî kêmbûna zanîna ye, dema mirov ne têgihîştî be, avarêbûn dibe tiştêkî siruştî.

"Peyva berî dîrokê, tevliheviyekê pêk tîne di warê pêzanîna de, ji bo tercîheke di cihê xwe de peyvên wekî "dîroka berî şaristaniyê" an jî "dîroka berî çinayetiye" rastir in" (r.15) Bi van gotinên xwe nivîskar lê dixebite ku dîrokê bike du beşan.

Li vir tiştêkî yekgirtî tê parçekirin. Heke wisa be, dema tu tîkiliyên organîk ên di navbera van her du beşan de ji holê rakî, mirov dê her du beşan wekî du tiştên ji hev cuda nebînin? Niha tiştêkî din tê bîra mirov, nexwe em jî mirovan bikin du beş; "mîrovên şarezî" û "mîrovê ne şarezî" bes pîvan çî ye? Şarezayê îro wê nebe, hoveberê sibe? Ma çêdibe ku mirov tenê ku ji ber dema berê dijî, navê hoveber li yekî bike? Bi dîtina min çênabe. Ka zanistîbûn li ku ma? Heke em gotinên xwe bidin hev:

A) Tê gotin ku kesê ku dîrokê çêdike mirov e. Li navendê mirov û afirandinên wî tê danîn.

B) Li aliyê din mirovan dike du beş û dixwaze ku mirov di du pêpelûkan de bê nirxandin. Pişt re jî dide zanîn ku dîrok bi nivîsê dibe dîrok.

Ne di cihê xwe de ye ku yek ji mirov û hilberînên wî bikeve rê, van bixe navenda dîrokê, rast nabe. Dema lêkolînerên ji beşên din ên zanistê jî rabin hin tiştan li gorî daxwaza xwe bixin navendê, bîr û baweriyên xwe bi vî awayî pêk bînin, wekî kû li derveyî van tiştan, tu



**"Nexwe cudatiya di navbera dîrok û gotegotê de ev e, dîrok bi şiyaneke herf bilind li rastiye digere û ji bo vê yekê xwediyê bingehê ye." (23) Lê bi dîtina min ferqa di navbera wan de bi tenê dîrok nivîskî ye, gotegot devkî ye. Heke nivîskar hinekî li ser folklorê xebat bikira, wê bi çavekî din li dîrokê binihêrta..**

tişt nehate kirin, çênabe. Bo nimûne, mîrovên pêşin ji bo xwe porkirinê (nuxamtin) kinc li xwe kirine. Sedema vê yekê bi mercên cografîk, baweriyên olî û xweparastinê ve girêdahiye. Niha armanç bi giştî guheriye, kinc wergirtin bi sedemên estetîk ve tê girêdan. Dema mîrovên ku li ser kinc wergirtinê yên folklorê lêkolînê dikin bibêjin, kincên destpêkê û yên niha min eleqedar nakin, bi tenê kincên dema navîn girîng in ji bo min, ew dê bikevin xeletiyê. Heta dema mirov wisa mijarê ji hev parçe bike, tî-

kiliyên di navbera serdeman de ji holê radîbin û lewre jî encameke baş ji lêkolîneke bi vî rengî dernakeve. Metoda rastîn ev e ku mirov tîkiliya diyalektîk a di navbera van cil û bergan de jî li ber çavan bigire.

"Têgiha berî dîrokê, hinek mirovan bi awayekî vekirî mehkûm dike. Lewre dema mirov dema kesê destpêkê wekî "berî dîrokê" bi nav bike, wekî ku ew li derveyî dîrokê jiyabin, dîrokeke wan tune be tê fêmkirin. Heta hinek kes karin vê yekê jî îdia bikin. Lê dîrokeke wan jî

heye, lewre mirovbûn di nava dîrokê de cih girtin e." (r.18)

Di mantiqê vê gotinê bi xwe de nakokiyek heye. Wekî me li jor da xuyakirin, mirov ji ku dest pê bike, bi çî dest pê bike? Mîrovên ji bo hêskirina mercên jiyanê hilberîn pêkanîna, me jî îro zede-bahiyek pêk aniye.

Em lê xebitîna ku ji berhemeke mirovan bikevin rê, paşê me gotiye ev tişt mirovan afirandiye. Ev nakokiyêke mezin e. Mantiqêkî bi vî rengî wê me bixe nava xeletiyên. Tiştê Gûrdal Aksoy kiriyê jî ev e. Wekî encam belgeyên di serdema berî nivîsê de hindik bin û mirov di ser de rabe wan çewt bi kar bîne, tiştê heyî bi kêr nayê.

Wekî lêkolînerê folklorê min hay jê heye ku li gorî diyalektîk-materyalîzmê tu tişt ji tunebûnê çênabe, tiştêkî di qonaxa demê re vediguhere û bi rengêkî din derdikeve holê. Dema mirov bi vî awayî li mijarê binêre, divê mirov bipejirîne ku qonaxa berî nivîsê jî heye. Nivîs ji nebûnê heyî nebûye. Mîrovê berî peyda-bûna nivîsê bi çî awayî bi hev re tîkîf datanîn, bîr û ramanên xwe derdibirin (îfade dikirin) pêwîst e mirov li ser vê yekê bifikire. Dibe ku nêzîktêdayîneke klasîk be lê:

A) Bi riya lasayîkirin (teqlîdkirin) an jî xweber jiyana xwe bi rê xistin.

B) Xêz, wêne û çînen ku li ser hestî û li ser diwarên şêsthan di vî warê di hinek pêzanînan didin me.

C) Digel zêdebûna celebên xwarinan, di mêjî û xencereya mirovan de pêşketin çêbû, bi vê yekê zimanê axaftinê çêbû, pişt re ji peyvên re hinek sembola hatin dîtin.

D) Di encama van gişkan de nivîs derket holê.

Her wekî min di destpêkê de jî da zanîn, dema mirov nivîsê bixe navendê û nirxên berî vê paşçav bike, ne rast e. Heke mirov ji şaxê folklorê dansên klasîk minakê bide: Mîrov ji bo ku hestên xwe yên wekî evîn, xemgînî, çošî, şînê û hilberînên xwe ragihîne ketine nava xebata afirandineke bi vî rengî. Her bizav û tevgerêke di dansê de xwediyê taybetiyekê ye û tê de mesajek heye. Digel muzîk, cil û bergan, li ser dikê dema tê pêşkêşkirin, roleke hêvojkar jî pêk tîne.

Dema mirov baş bala xwe bide, tê dîtina ku dema tiştêkî bi pergalê dibe zêdetir berhemdar dibe. Ew tişt jî yên berê pêşketîtir e, dema mirov çavên xwe ji rastiye re bigire, mirovan li gorî berhemên wan jî hev veqetîna, xeletî çêdibe.



## Dîrok û gotegot

"Mirov kare bibêje ku di destpêkê de gotegot (mîtos) hebû..." (r.21) Li gorî nêzîktêdayîna xwe ya berê wiha bibêjim destpêkê gotegot nîn bû, beriya wê hebû. Di vê qonaxê de gotegot pêk hat. Jixwe çavkaniya ku nivîskar nîşan daye, yanê pirtûka V.P. Alekseyev a bi navê "İnsan Türünün Kökeni ve Gelişimi" ango Binyad û Perisîna Mirovan ku ji aliyê Alaeddin Şenel ve di sala 1993'yan de li tirkî hatiye wergerandin, kitekî li ser bandora pêşketina mêjî û xencereyê di warê pêkhatina çand madî û manewî de radiweste.

Her ku malzemeyê di destê mirov de zêde dibe afirîneriya wî jî zêde dibe. Ji pêşketina zimanê axaftinê gotegot derket. Li ser pirsra "gotegot dîrok e, ne dîrok e" jî ez dikarim vê bibêjim, heke dîrok bi belgekirina jiyana mirovan be, mirov nikare ji tevahiya jiyane beşekî bigire û derxe pêş.

Wekî folklorîstekî ez dikarim bibêjim ku di çêbûna gotegot, çîrok û destanan de tesadûf tune ye. Heke heta îro hatîbin (çi biguherîn, çi jî bêguherîn), sedema vê yekê xurtbûna bingeha wan e. Li aliyê din li ser vê demê hinek agahiyan dide me. Jixwe tiştê ji bo me girîng jî ev alî ye.

Nivîskar ji Feyerabend îktîbas kiriye, ew dibêje: "Agahiya îro dikare bibe çîroka sibê, lê efsaneyê herî komîk dikare bibe bingeha zanistê." Di baweriyaya min de jî ev gotin rast in.

Nivîskar ferqeke wisa dixwe navbera dîrok û gotegotê: "Nexwe cudatiya di navbera dîrok û gotegotê de ev e, dîrok bi şiyaneke herî bilind li rastiye digere û ji bo vê yekê xwediyê bingehê ye." (23)

Dîrok li rastiye digere, lê dîsa tiştên

nivîskî rast in, ên mayî pûç û vala ne li gorî nivîskar. Lê bi dîtina min ferqa di navbera wan de bi tenê dîrok nivîskî ye, gotegot devkî ye. Heke nivîskar hinekî li ser folklorê xebat bikira, wê bi çavekî din li dîrokê binihêrta.

"Bi kurtasî, zanist ne tenê berhevkirina rastiye ye û berhevkirina rastiye jî bi qasî ku li dibistanan tê gotin ne hêsan e.

Dîrok jî wekî beşekî zanistê ne tenê berhevkirina rastiye ye. Gotegot û çîrok jî ji ber ji nav mercên dîrok û civakî yê demekê derketine holê, li ser bîr û baweriyên wê demê hinek agahiyan didin, lewre jî xwediyê wateyêke dîrokî ne." (r.27)

Ev gotinên nivîskar, gotinên wî yê berê pûç dikin. Dema mirov lêkolînê li ser dîrokê bike, divê ji beşên din ên zanistê wekî cografya, antropolojî, folklor û civaknasiye jî sûde wergire.

## Kurd û dîrok

Bi giştî ez bi tiştên ku di vî beşê de hatine gotin re me, li du sê xal hene ku ez ne pê re me.

Tê gotin ku "Ji xeynî çend xebatan mixabin kurd hîn riya nivîsandina dîroka xwe peyda nekirine. Heke dîtîbin jî zêde kar nekirine di vê rê de. Sedema vê yekê ev e ku civakê pêdiviya xwe ya ji bo rewşenbîran temîn nekiriye." (r.4) Ev tesbît di cihê xwe de ye, jixwe ji mantiqê kû bikeve her tiştê seretayî (ji bo ku bike malê xwe) mirov kare çî hêvî bike. Mirov nikare ji lêkolînên bi vî awayî re bibêje lêkolîna dîrokî.

"Êdî divê di vî warê de hinek gavên mezin bîn avêtin, hinek sazî bîn avakirin. Lê divê ev sazî di bindora jiyana kurdan ya îro de nemînin, divê ew nebî navendên galegalan." Ne tenê di

warê dîrokê de divê di hemû waran de gavên bi vî rengî bîn avêtin. Hinek pêşnimûneyên wê hene.

Lê nêzîktêdayînen kevna-re li ber van gavan dibin asteng. Nivîskar rexneyan li saziyên heyî digire, ji ber ku ew wezîfeya xwe nayinin cih, gotinên wî rast in, lê divê mirov pêşî saziyên heyî nas bike, wan bîne ser riya rast. Jixwe hejmarê wan jî ne zêde ye.

Bo nimûne Navenda Çanda Mezopotamya-ye heye. Min li wir dersên dîroka folklorê û dersên dansên klasîk dan, kesî jî min re negot divê tu dersan wisa bidî, van bêjî, yê din nebêjî.

Berevajî min yekê bi li gorî zanîna xwe bi vî û daxwaza ders xwe dida. NÇM saziyêke ku dixwaze afirînerî û lêkolîneriyê derxe pêş. Dibe danheva van terê neke, lê sedemê vê yekê ne helwesta mirovan e.

Gelemşeyên aborî, civakî û siyasî li ber geşedanê dibin asteng. Mirovên kurd li metropolan dijîn, nikarin herin



welêt, malzeme ber hev bikin. Jiyan metropolan mirovan dihelîne, ji bo gihandina kadroyan û finansêkirina xebatan, derfetên aborî divê.

Li aliyê din zimanê kurdî di warê axaftinê û berhemên devkî de pêşketî ye, lê di warê nivîsê de zêde nayê bikaranîn. Ev tişt digel rewîşt û nêzîktêdayînen berê li ber pêngavên nû dibin asteng

(Dawî)

WERGER JI TIRKÎ:  
SAMÎ BERBANG

## Nirxandineke giştî

MEDENÎ FERHO



S al bûrî!.. 365 rojên Kalenderî xelas bûn, çûn. Çanda kurdî ya hemdemî çi qasî hate afirandin? Helbet di nava vê pirsê de ne bes berhemên nû cih digirin. Li vir, pêwist e ku em balê bidin ser kevniyê jî. Çanda demsalên berê!.. Ji ber ku çanda kurdî bi nivîskî mîna pir welat û xelkê, di navende sedsala 19'an de dest pê kiriye. Heger-di nava parantêzê de bête diyarkirin, afirandinên berî sedsala 19'an jî hene. Çiqasî ne berdest bin jî, hinek agahdarî û têbînî vê ragihandinê didin me. Bo demjiyaneke bi serfirazî û serwextî bibe dîrok, divê dergehê jiyana xwe dade û ji nava xislet û kesayetiyên xwe hatibe dîrketin. Çiqasî hewna (fikir) di encameke rawanî de jiyana bike û bandorê li ser komên xelkê bike jî, rastî

ev e..

Her wiha kevna-rî ku tim bûye bingeha avahiyên çandî, pêwistiya lînerî û şîroveyêke bêteref û objektîf dibîne.. Yan jî mîna xelkê em xwedanê van berhemên nemir bi xwe bidin axaftin. Ha, heger xwedanê berhemên û axaftinê ne mimkûn be, pêwistiya lînerî û şîrovekirina bêteref û objektîf dimîne.. Şîrovekirina aqilmendên kevn, bi lînerînen hemdemî, di nava kirasê politîka îroyîn de nayên şîrovekirin. Nêrîna lêkolîner dikare xwendevan têxê nava şelişibûnê. Heger bi nêrîneke bêteref û objektîf xwedanberhem bi fermayî xwendevan bibin, şîrove dimîne di aliyê xwendevan de.

Dem di nava qarqêşûneke mezin de ketiye qonaxa guhartinê. Êdî rojev di nava komên xelkê de ev guhartin e. Guhartina ku bandorê li jiyana pêşerojan bike ye. Karmendiya nivîskaran nemaye çîrok û çîvanok. Di du hêlan de pêwistî derketiye. Hemberî pênûs-şorên kurd de. Bêguman xwedî derketina li guhartinê di mercên hemdemî de, xwe dîtî.. Û parastina xwe dîtî (nasnameya xweserî) di

pêşerojan de. Navê her du pêwistiyan jî şoreş e!.. Şoreş nûjenî ye, guhartin e. Ev nûjenî û guhartinê zorê dixwaze, parastina wê jî zorê dixwaze. Helbet zor ne bes çekdarî ye, karûbarê bêrawestandin e jî.

Mixabin sal zivirî, 365 rojên kalenderî bûrî, dev ji afirandin û pêkanîna berhemên sereke û derketina holê berdî, di vê sala bûrî de jî zimanê kurdî ma bêferheng. Bêguman hinek gav hatin avêtin. Lê, ev gav pir bêdeng û hêdîka bûn. Kovar zêde bûn. Kovarek, wergerê jî hate afirandin. Pirtûkên li ser zaravayên kurdî yê lêkolînî derketin meydanê. Romanê, çîrokê, helbestê bédengiya xwe domand. Weşanxaneyên di nava sînorên Tirkiyeyê de her dem daqoqên dijmin di ser serê xwe re dîtî, di nava astengên aborî de gevîzî. Ji bo weşanxanên derveyî welat ev dijwarî tune bûn- dijwariya li hemberî weşanxanên li Ewrûpayê nezanî û qelsiya estetîk û mîzenpajê û hişmendiyê (yanî nezanî) bû.

Hêvî, di nava xeftanê risasî de maye sala nû ya 97'an..



# Girê Gêrsin warê Egît bû

Heval di newalê de li hemberî bihezaran leşker û ceşan êdî amade bûn. Dijmin bi barandîna gula û bombeyên firokan şer da destpêkirin. Hevalan bi kîn û nefreteke mezin a hezar salan şerekî dijwar bi lêhengî û egîtî dimeşandin. Li milekî Çiyayê Herekolê, li milê din çiyayên Pîran, çiyayên Mêhrînan. Li ser her newal û girekî goristana şehîdê me heye. Wekî hevalên Edîp, Cemîl, Sultan, Zahîde, Salîh, Sertaç û Orhan. Besta, li ser sînga xwe bi şervanên azadiyê jî, li xweşîkbûna xwe, xweşîkbûneke din zêde dike.



**S**al, 1988. Cih Besta Botan. Di dîroka berxwedanê de rûpeleke nû hat nivîsandin, li Botanê li Herêma Bestan. Dema ku qala Botan tê kirin, gelo çi tê hişê mirov? Bersiv tim yek e, warê şerekî dijwar û ji bo dijmin warê tîrsa mezin e. Ji bo gelê me û mirovahiya pêşverû jî, warê têkoşîna azadiyê, mirovahiye hêviya xelasiyê, warê Egît û Pilingan e.

Demayê zivistanê, her derê dicemidîne, berf û baran dest pê dike. Ev ji şer re jî dibe asteng. Ji ber vê yekê jî hêzên gerîla li hev kom dibin, ji bo çalakîyên rojên pêş civînan çêdikin û biryarên girîng distînin. Di bin rêberiya Heval Muslim de hêza li Botan di Herêma Bestan de wê demê kom dibûn û dicivîyan. Di wan mehên sar de hevalan bi tevayî problem û kêmasiyên xwe û şer dianîn holê, ji bo ku bi ser bikevin taktîk û teknîkên nû diafirandin. Di dawîya wê civîna perwerdehiyê de, bi sonda xwe girêdana bi partî û serkatiyê ve, xatir ji hev û din di xwestin, her kom diçûn heremên xwe.

Li Herêma Besta koma hevalê Muslim mabû. Hevalê Muslim di nav hevalan de yê bi emrê mezin bû. Lê belê ew qas xuya nedikir, nedigot ez extiyar im. Her tim bi fedekarî, cesaret û bi baweriyeke mezin dihat dîtin û naskirin. Ji ber vê yekê hevalan zehf jê hez dikir. Heval Muslim, ji hevalên xwe re dibû çavkaniya kêf û moralê. Pir bi henek û kêfxweş bû. Her êvar dibû dema êzing komkirinê, gazi hevalan dikir, digot: "Em hevalên xort herin êzingan." Bi vê bangê heval dikenîyan û bi şewq

diçûn. Ji hevalan re tim digot: "Em ji şerê biharê re xurt û amade bin ku, em derbeyên mezin li dijmin bixin."

Hevalê Muslim di nava têkoşînê de li hemberî tu astengî, zor û zehmetiyan, berf û bahoz û hwd. serê xwe netewand, gazin nedikirin, tevî vî emrê xwe jî tu car ji xwe re ne digot "Ez extiyar im", her tim ev digot: "Yê extiyar û bê-mecal dijminê me yî dagirker e" Bi girêdana serokatî û şehîdan ve, bi mîrxasî û qehremanî têkoşîn dida. Peyva wî her tim ev bû: "Serkeftin a me û ya gelê me ye."

Serê biharê hêdî hêdî berf diheliya. Ji bin çiya û kendalan, rûbar der dibûn û diherikin li dest û newalan belav dibûn. Şalûl û bîlbilan li ser lavîniyan dixwendin. Serê simbilan derdiketin, qebaqeba kewan li ber belekên berfê, dixuyan. Di wê demê de şervan û cengawerên me ji cihê xwe yên bin erdê hêdî hêdî derdiketin, wekî kulîlkên berfin û beybûnan. Her yekî li hêlekê bi awirên tijî bawerî û hêviyeke mezin li çiya dinêrin. Bi bîr û baweriyeke wisa xurt, wekî tirêja rojê çawa li sibê dibiriqîne, li serê çiyayê tûj dinêrin. Tê zanîn destpêka biharê, destpêka ceng û livbaziyan gerilayan e. Hevalê Muslim ji hevalan re wiha digot: "Me zivistan jî derbas kir, me perwerdehiya xwe bi serkeftineke mezin temam kir. Me soz daye serok û şehîdên xwe, gerek em wan sozên xwe bi cih binin."

Hevalê Muslim dişuxulî ji Girê Sor derbasî Girê Gêstin bin. Girê Gêstin warê hevalê Egît bû. Cihê civîna hevalê Egît bû, ji bo 15'ê Gelawêjê (Tebax)

warê biryara mezin a cerda ser Dihê (Eruhê) bû. Girê Gêsin, nêzî Osyanê bû û Osyan jî cihê ceşan bû. Wek her tim dişa îxaneta tarîxî serê xwe hildide û li ser gel û şervanê azadiyê jehra xwe vedireşand. Wekî marê kor, wekî Arpagos, Îdrîsê Bîtlîsî, Qasim, Rêber, Şahin Dönmez hwd. Karê xwe yê genî di pêkanîyê de dişa jî bi şûn ve namînin. Bi şefeqa sibê re ceşên herêmê, tevî leşkeran hevalan dorpêç kir.

Heval di newalê de li hemberî hezaran leşker û ceşan êdî amade bûn. Dijmin bi barandîna gula û bombeyên firokan şer da destpêkirin. Hevalan bi kîn û nefreteke mezin a hezar salan şerekî dijwar bi lêhengî û egîtî dimeşandin. Heya wextê nîvro jî şer domiya. Hevalê Muslim di şerde bi guleyeke bêbext û xayîn birîndar bû. Birîna wî xedar bû, xwîn ji birîna wî wekî rûbarek zirav diherikî ser axê. Bi wê birîne ve jî şerê xwe berdewam dikir. Hevalên nêzî wî ew dîtin, li pişta xwe kirin û ji nav şer derxistin. Hevalê Muslim li hemberî vî derdiket, qebûl nedikir ku ji şer bê dûrxistin. Digot: "Min dernexin ji nava şer, ezê şer bikim, tiştek bi min nehatiye." Lê belê birîna xedar bû û hevalan ew birin cihekî asê. Heval Muslim bi cih bûbû, şer didomîya. Hevalê Muslim li wê derê tim pîrsa hevalên şervan dikir û rewşa wan bi dest re hîn dibû. Lê belê çavên wî wekî stêra ber bi sibê dihat ser hev û din, wekî gul û kulîlkên ku bêav bimînin. Çavên xwe vekir û bangî hevalan kir, got: "Gefî heval û hogiran! Hûn dizanin ev der warê hevalê Egît bû. Sebra min pir li


vir tê." Hinekî sekinî, pişt re bi tilikên xwe îşareta serkeftinê çêkir, peyivî: "Ez ku bûm şehîd, min li serê vî diyarê bilind veşêrin. Ji bo ku bêhna hevalê Egît bê min. Roja Kurdistan rizgar bibê, bila keç û xortên kurdan bi destên hev bigirin û werin ser gotistana me, mizgîniya rizgariyê bidine me. Bijî Sarok Apo, Bijî Şerê Çekdarî." Bi van gotinên xwe re wekî çira bê vemirandin, çavê hevalê Muslim hatin ser hev û tevî karwanê şehîdên nemir bû.

Şer heta tarî ket erdê domiya. Piştî ku dijmin tev bi paş ve vekîşiya, hemû heval li hev civîyan û li ser şer axivîn. Ji bo hevalê Muslim ketin rêzgirtinê û li ser rê heval şehîd Muslim û şervantiya wî hevaleyê şitexilî, soz dan ku çeka hevalê şehîd rakin û bigihîjin serkeftinê.

Her girekî Bestan bi xwîna şehîdan xemiliye. Her çar aliyê çiya, newal û daristan in, di nav daristanê Bestan de bi sedan sulavên xurt û qerisî diherikin. Rûbar diherikin ser geliyan wekî ava Ferat li ser Beriya Haranê. Di destpêka biharê de li ber sînga Herekolê konên reş, li dora wan berx û mîhan, pezkovî, hesp hwd. jiyana xwe di hembêza xweşîkbûn û harmoniya çiya de dimeşînin. Li milekî Çiyayê Herekolê, li milê din çiyayên Pîran, çiyayên Mêhrîna. Li ser her newal û girekî goristana şehîdê me heye. Wekî hevalên Edîp, Cemîl, Sultan, Zahîde, Salîh, Sertaç û Orhan hwd. Bestan, li ser sînga xwe bi şervanên azadiyê jî li xweşîkbûna xwe, xweşîkbûneke din zêde dike.

ŞERVAN AHMET





● 2.1.1920

Sînorên Mîsak-f Milli (sonda neteweyî) hate pejirandin

● 13.1.1910

Helbestvanê kurd, Şêx Rîza Telebanî çû ser heqîya xwe.

● 15.1.1994

Karsazê kurd, Behcet Cantürk ji aliyê hêzên tarî ve li Stenbolê hate revandin, paşê jî cendekê wî li sêguha Düzce, Sakarya û Hendekê hate dîtin.

● 16.1.1665

Karbidestê Partiya Demokrasiya Gel (HADEP) yê Batmanê M. Zeki Aldîg ji aliyê hêzên tarî ve hat kuştin.

● 17.1.1991

Li hemberî dewleta Iraqê Hereketa Bahoza Çolê dest pê kir. Ev herakat bi xwe navê Şerê Kendavê ye.

Pîştî ku dewleta Iraqê Kuveyt dagir kir, hêzên împêryalîst bi taybetî jî Amerîkayê ji bo parastina dîvikên xwe, Şêxên Petro-dolar, ajotin ser Iraqê û ev şer dan destpêkirin.

AWIR

# Konsera Dengbêj Seyda û girîngiya çanda devkî

Di demên derbasbûyî de civaka kurd bi çîrok û stranên wan di-keniya, digirîya û bi xwe dihesiya. Gava ku diçûn di (gund) û bajaran jûr (ode) heta serî tiji dibû. Wan di şevên zivistanê yên sar û diwar de jiyana kurdan bi çîrok û stranên xwe dixemilandin. Zarok di paşila dayika xwe de bi xewa ve diçûn. Dêrdên evîndaran kûrtir dibûn. Agir berdidan dilê evîndaran. Carina jî ji bo ku berdevkiya mîr û axayan dikirin, dihatin lomandin. Memê Alan, Zembîlfiros, Siyabend û Xecê bi xêra wan heya îro hatin. Em bawer in we fêhm kir ku em qala kê dikin.

NÇM'ya Stenbolê şaxa Beyoğlu di 4'ê rêbendana 1997'an de Dengbêj Seyda bi erbaneya (def) xwe konserek pêşkêşî hunerhezan kir. Seyda di destpêkê de bi awayekî kurt li ser dîroka erbanê û dengbêjîtiyê hin agahî dan. Seyda diyar kir ku, erbane di dîrokê de amûra (enstûrman) herî kevnare ye. Berê di her malên kurdan de du sê heb erbane hebûne. Seyda bi kincên xwe yên neteweyî û bi çosêke mezin, carina rûniştî, carina jî li ser piyan bi awayekî ji xwe çûyî li erbaneya xwe dida. Wî, ji Feqiyê Teyran hin helbest strandin û tevî stranên çîroka zembîlfiros jî vegot. Konser ji ber kêmbûna dem û beşdarên gelekî kurt ajot.

Pîştî qedîna konserê Seyda bi dilekî germ pirsên me bersivandin. Li gorî agahiyên Seyda, ew 40 salî ye û li Malazgîra Muşê li gundê Tendûrekê hatiye dinyayê. Ew xwediyê deh zarokan e û wêsta (nika) di nav rêveberiya HADEP'ê ya Kağıthanê de cih digire. Wî da zanîn ku, wan ji ber zordayîna cerdevaniyê (qorîcî) dev ji welatê xwe berdaye. Her wiha berî vê konserê jî wî li NÇM'ê du konser pêşkêş kirine. Wî daxuya kir ku, daxwaziya wî ya lédana erbanê di zarokatiya wî de dest pê kiriye. Wê demê bi awayekî veşarî ji bo hînbûna lédana erbanê wî li bêjîngê daye. Ji derva li kesên ku li erbanê dane sêr (temaşê) kiriye.

Seyda da zanîn ku, erbaneya wî û hin dengbêjên din ji aliyê leşkeran ve hatiye şêkêndin. Li gorî agahiyên Seyda, gava



ku li ser şexsiyetên kurd û serhildanên kurd strandine erbane ya wan hatiye şêkêndin. Lê, kes têkilî yên ku li ser evînan û evîndariyê, keç revandinê, heyf hilanîne, strîne nebûye, wan bi awayekî hêsanî karê xwe meşandine. Seyda hinekî jî li ser dengbêjên berê deyn kir (peyivî). Wî da zanîn ku, berê gava ku dengbêjan li erbanê didan çîraya (lambe) jûr (ode) hatiye vemirandin. Wan deman du sê dengbêjan bi hev re li erbanê dane.


Dujna (ji xeynî) wan agahiyên Seyda da zanîn ku, ji ber daxwaza hin xwendekarên Zanîngeha Bogazîçiyê, ewê li NÇM ji bo hînkirina lédana erbanê dersan bide. Seyda, di dawîya axaftina xwe de diyar kir ku, hin kes dengbêjîtiyê ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî bi kar tînin û got ku, divê dengbêjîti bibe parastin û jiyandin. Her wiha Seyda kurdên ku ji bo axaftina bi kurdî hewl nadin xwe rexne kirin da diyar kir ku, divê kurd li her derê bi kurdî deyn bikin (bipeyvin).

Kêmbûna hejmara beşdar careke da çespond (teyîd kir) ku girîngiya zargotîna kurdî hê nehatiye fêmkirin. Lê ji ber ku çanda me ya nivîskî qels e. Girîngiya dengbêjan zêdetir dibê. Lewra ji gelek hêlan ve dîrok û çanda me bi awayekî sergirtî di çîrok û stranên dengbêjan de veşartiye.

EŞREF SÎDAR

## ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YİĞİT



### Rojnamegeriya kurdî (2)

Li ser dîroka rojnamegeriya kurd heta niha hejmarek lêkolînên bikêr hatine kirin. Ev xebat ne hindik in. Em ji vê kovarê û kovara din li ser van xebat û lêkolînan dibin xwedî agahî. Wekî hevpeyvînen Bepîrsê Nûdemê Firat Cewerî, meqaleyên Lokman Polat di çend hejmarên Nûdemê de û meqaleya Salih Heme Ferhad di Roja Nû hejmar 29, sal 1991'ê û hwd. de. Li aliyê din divê mirov bi taybetî xebatên Malmisaniyê û Mehmûd Lewendî ji bir neke û bibêje ku ev xebat ducildî heta niha bi qasî ku em zanin serçaviya helî baş e ku li ber destên me ye û kitêbxaneyên me neteweyîtir dike.

Berhemêke din ku bi karekterê xwe cihê ye, bi tenê li ser rojnameyê ye û bi hêjabûna xwe ne kêmi xebata Malmisaniyê û Mehmûd Lewendî ye, berhema M. Emîn Bozarslan e. Berhema gotin li ser e, piştî xwe dide disiplin û xebateke nişmî ku bi salan kişandiye. Bozarslan ne bi tenê rojnameya Kurdistan wergerandiye ser tîpên latînî û tirkîya osmanî kiriye tirkîya îro, belê her wiha di pêşgotîneke 50 rûpelî de li ser naveroka rojnameya Kurdistan, damezrêner û xwediyên wê, Bedirxaniyên bira Mîqdat û Evdîrehman sekiniye, di dîraset û analîzeke hûr de ta bi derziyê vekiriye. Bi alîkariya vê pêşgotîna bi kurdî xwendevanên ku bi tirkî nizanin, dibin xwedî mefer ku giş serpêhatiya rojnameya Kurdistan nas bikin û li ser naveroka wê bibin xwedî dîtin û fikir. Lê ev heye ku beşek mezin ji xebat û lêkolînên heta niha hatine kirin, xebatên înfomatîv û faktaîyî ne, ansiklopedîk û katelogî ne.

Îro ku rojnamegeriya me ji noqta destpêkê gelekî dûr ketiye, giş çeper û zora dagirkeran nikare rê lê bigire, ne salê, belê mehê bi dehan kovar û rojnameyên me derdikevin, kerwanê şehîdên rojnamevanên rojnamevanên we wiha here dê rekora dinyayê bişkîne, di demekê de ku ev çend sal in êdî bi navên Musa Anter û Nûreddîn Zaza her sal xelatên rojnamevaniyê tene belavkirin û musabeqe tene lidarxistin. Her wiha di demekê de ku yekîtiya rojnamevanên Kurdistan hatiye damezrandin û Nîsana sala 1998'an temenê rojnamegeriya me dê bibe sed sal, hewcedarî bi lêkolînên kûrtir, analîtîkîr û bertengtir lê întenzîvîr heye. Êdî xebatên bi tenê, xwe bi rastiyên kurd û kîna sînorê dikin, mîna filan rojname filan salê çêbû, temenê wê ew çend bû, birêveber û xwediyên wê filan û bêvan bûn, li filan cihî çavên xwe vekir û li dera han gihîştê dawîya xwe û hwd. Birsiva hewcedariyên qonaxê nadin. Her çendî bi sarê xwe karên pir hêja û pêwîst bin jî. Em divê hinekî din kûrtir herin û hinekî din zêqîrtir dakevin.

Hefteya yekemîn ya meha Tebaxa sala 96'an em çend heval li mala Dr. Cemşîd Heyderî gihabûn hev. Cemşîd wan rojan ji Belçîka vegeyabû. Ew ji bo civînekê ku ji bo amadekirina ansiklopediyê kurdî li dar xistin, çûbû Brukselê. Piştî sohbetêke bi kelk û hin agahdariyên li ser civîna û beşdarên civîna wê ku Cemşîd jî yek ji wan bû, digel hinek pêşniyazên xwe, mizgîniyek da li ser rojnameya Kurdistan.

Ewîl mizgîni: Du hejmarên dawî yên rojnameya Kurdistan ku heta niha wundabûn ew jî hatin dîtin. Kesê ku dîtine Ferhad Pîrbal e. Wek xwendevan zanîn, hejmarên winda 5 bûn: Ev hejmar 10,12,17,18, û 19 bûn. Du hejman ji wan, hejmarên 17 û 18 Malmisaniyê pêda kirin û tevî hin aqêdariyên hêja sala 1992'yan wekî kitêbêke çap kir. Mabûn hejmarên 10,12 û 19: Niha hejmarên mayî jî hatine dîtin û bi vî awayî 31 hejmarên yekemîn rojnameya kurdî, Kurdistanê temam dibin.

Em bîr ser pêşneyarên Dr. Cemşîd Heyderî. Ev pêşneyar sê heb in û bi bahweriya me gelekî di cihê xwe de ne. Pêşniyaz ev in:

1- Bi minasebeta sedsaliya rojnamegeriya kurdî heta sala 1998'an divê careke din, vê carê bi şeweyekî ku dîroka rojnamegeriya kurdî li giş perçên Kurdsitan, li hundir û li derve berhebbêz bike dîroka rojnamegera me bê nivîsandin.

2- Divê albûmeke rojnamevanên kurd bê amadekirin. Di vê albûmê de pêwîst e wêneyên giş rojnamevanên me ku di riya rojnamegeriya kurd de serê xwe danîne yan jî şehîd ketine, di vî cêbhe û warî de xwedî xizmet in, bêne civandin.

3- Pêşengeheke dewlemend û layiqî rojnamegeriya kurdî gerek bê amadekirin û lidarxistin. Ev pêşangeh gerek ne sabît be, divê seyar be û tim bigere û her serê demekê li welat û bajarekî Ewropayê bête pêşkêşkirin.



# Rastiya gundê kurdan

**Gundê kurdan ê li Rûsyayê di çapemeniya tirk de gelek nav û deng da, vî gundî kir ku gelemşeyên dîplomatîk di navbera Tirkîye û Rûsyayê de zêde bibin. Î. XORT ÇÛ VÎ GUNDÎ BI DÎREKTOR, XEBATKAR Û ŞÊNİYÊN WÎ RE AXIVÎ. Her wiha hevdîtinek bi Berpirsê ERNK'ê yê YDS'ê Mahîr Welat re jî çêkir.**

**G**undê kurdan ev demeke dirêj e ku bi taybetî di rojê va têkiliyên di navbera Rûsya û Tirkîyeyê de ye. Heya li gorî hin çavkaniyan, kirîna gundê kurdan, ji aliyê Tirkîyeyê di civînên welatên Rojava û NATO'yê de jî hatiye nîqaşkirin. Ji bo vî gundî geh gotine "gundê PKK'ê" û geh jî gotine "kampa PKK'ê." Bi rojan di çapemenî û weşanên Tirkîyeyê de, li ser gund hatiye rawestîn û antî-propagandaya vî gundî hatiye kirin.

Heya îro bêhtir ji devê kesên dijberên kurdan agahî der barê vî gundî de hatine belavkirin. Me jî xwest em rasterast agahiyên der barê gund de ji devê rûniştvanên vî gundî bistînin û wan pêşkêşî we xwendevanên xwe bikin û gund bi we bidin nasîn.

Gund ji aliyê siruştîya xwe ve tevî daristan û çem, ku ew çem şaxekî Volgaya ye, tu dibêjî qey parçeyekî ji buhiştê ye. Lê mixabin li vî welatî çar demsal tune ne! Tenê bihar û zivistan heye! Zivistanan serma 30-40 dereceyî dadikeve binê sifrê. Biharan jî serma û baran cih diguhere. Biharan roj saet di 11'an de diçe ava û tenê çar saetan dinya tarî dibe. Zivistanan jî roj saet di 4'an de diçe ava û tenê 7 saetan dinya ronî dimîne.

Gund ji aliyê avahî û teknîka xwe ya ku heye ve jî, hêviya xebateke mezin di-de mirov. Nêzî 300 mirovî bi rehetî dikarin tê de bi cih bibin û bijîn. Xwarin-geh û salona tiyatroyê jî, ji bo bikaranîna amade ye!

Ev gund, bi jiyana û xebata xwe, bi armanc û xwestekên xwe çiqas hemdem be jî, bi çêlek, golik, kûçik, dîk û pisîkên xwe û bi hin rengên jiyana xwe, bi malbat û zarokên xwe, gundekî modern û Kurdistaneke biçûk tîne ber çavên mirov. Lewma, ji gotinan bêhtir me xwest ku rûniştvanên gund, gund bi me bidin nasîn. Lê berî ku em ji rûniştvanên gund pirsên xwe bikin, me ji Berpirsê ERNK'ê yê Yekîtiya Dewletên Serbixwe (YDS) û Ewropaya Rojhilat Mahîr Welat pirsî.

\*\*\*

*Ji aliyê kurdan ve kirîna vî gundî di navbera dewleta Rûsya û Tirkîyeyê de bû sedema krîzeke dîplomatîk. Gelo çima dewleta tirk ji vî gundî ew qas aciz bû û xwest ku gund bê girtin?*

**N**êzî problema gundê kurdan ê li Rûsyayê, gurêdayî hemû problema kurdên li YDS'ê ye. Kurdên YDS'ê bi sed-salan berê ji ber zilma tirkan reviyane û koçberî Rûsyayê bûne. Piştî koçberiyê bi demeke kin, sosyalîzm li vî welatî ava bûye û rewşa kurdan jî pê re guheriyê. Çawa ku li vî xerbiyê bûne penaber û

problemên wan ên jiyani, çandî, civakî hebin jî bi vî re, yanê bi avabûna sosyalîzmê re, baş-xerab çanda xwe û kurdîtiya xwe jî parastine.

Gava ku sovyet hilweşiya, hemû miletên ku hebûn berê xwe dane welatê xwe. Mîna kazak, gurg, ermen û yên din. Lê kurdên Sovyetê welatê wan di bin dagirkeriyê de bû û li welatê wan şerekî neteweyî hebû. Kurd ne xwedî welatekî azad bûn. Ji bo vî jî, em dikarin bibêjin ku miletê herî zêde tehde ji vî hilweşandinê dît, kurd bû. Belê şerê neteweyî û rewşa kurdên YDS'ê kurd mecbûr kirin ku xwe ji nû ve tevger bikin, yekîtiya xwe çêbikin û asîmîle nebin û hin problemên xwe bi vî awayî çareser bikin. Li ser vî bingehê yekîtiya xwe ava kirin. Û vî yekîtiyê bi alîkariya gel ev gund kirî.

## Kurd di vî gundî de xebatên çandî dikin

Di vî gundî de, xebatên wekî di warê huner, çand, çapemenî û ziman de.. hene. Kurdên YDS'ê bi vî gundî dixwazin xwe bicivînin ser hev û dawiyê li belawelabûna xwe bînin.

Tirkîye pir vekirî çawa ku li welat politikaya qirkirinê dimeşîne -ku di dîrokê de nehatiye dîtin- dixwaze destê xwe dirêjî xebata kurdên vir jî bike. Li cihanê kurd li ku hebin û bixwazin xwe tevger bikin, çî politik û çî çandî, rejîma Tirkîyeyê dest dirêjî nav wan welatan jî dike. Ev bûye politikaya dewleta tirk. Netîceya vî politikayê ye ku Tirkîye dest di-avêje gundê kurdan. Di vir de xwe pir sivik jî dike.

Di warê hiqûqî, di warê têkiliyên navneteweyî û di warê dîplomasiyê de Tirkîye dikeve nav tengasiyê mezin.

**D**i warê huqûqî, têkiliyên navneteweyî û di warê dîplomasiyê de Tirkîye dikeve nav tengasiyê mezin. Hemû hêza xwe rakirîye ser piyan ku dengê kurdan bibire û yekîtiyên wan ji hev belawela bike. Ji bo ku bikaribe vî yekê bike û alîkariya dewletên cihanê bistîne, tawîzên mezin dane û xwe firotine gelek weletên cihanê!

Hemû hêza xwe rakirîye ser piyan ku dengê kurdan bibire û yekîtiyên wan ji hev belawela bike. Heya ji bo ku bikaribe vî yekê bike û alîkariya dewletên cihanê bistîne, tawîzên mezin dane û xwe firotine gelek dewletên cihanê!.. Ji bo ku "gundê kurdan" jî bê girtin tawîzên mezin xwestin bidin Rûsyayê. Ev xwesteka wan a girtina gund, ne nû ye. Ji dema ku ev gund hatiye kirin heya niha, Tirkîyeyê li Rûsyayê dest ji hemû karê xwe berdaye û li ser girtina gund dixebite. Sü-



leyman Demirel diçe, Tansu Çiller tê, ew diçe wezîrekî wan î din tê, ew jî diçe konsolos û diplomatên wan vî karî didomînin! Bi sedan name, daxwaz, tawîz û protesto tevîhej ji Rûsyayê re şandine.

Îro rejîma Rûsyayê, çiqas rûniştibe jî, dixwaze rejîmeke demokratîk saz bi-

xwe bi tevger bikin. Û Rûsya ne ji wan dewletan e ku li gorî xwesteka Tirkîyeyê bimeşe. Berî her tiştî berjewendiyên kurd û rûsan bêhtir nêzîkî hev in û politikaya Tirkîyeyê ya durûtiyê li hemberî rûsan li ber çavan e. Xwesteka Tirkîyeyê ya li ser komarên tirkî û Kafkasyeyê de-şifre bûne û rûs îro vî rastiyê bêhtir dibînin. Di vî rewşê de Tirkîye wê hêviya çî têkiliyan ji rûsan bike?

## Bersivên rûniştvanên gundê kurdan

*Hûn kirîna "gundê kurdan" çawa dibînin, xebata li vir tî kirin, gelo ewê bibe bersiva daxwaza gelê kurd? Hêviya we ji vî gundî çî ye?*

**Bavî Nazê** (nivîskar): Li gorî her tiştî divê rûniştvanên vî gundî bizanibin bê li vir çî karî dikin û armanca vî gundî çî ye? Navendên çanda kurdî yên li YDS'ê, yên ji hev belawela, li vî gundî bicihkirin wekî destpêkeke dîrokî ye. Navend ne ku wekî navendên li Ewropayê, an jî li Moskovayê hene bi hinek xebatan ve xwe girê bide. Ya girîng ew e ku hemû beşên kulturê di xwe de gewde bike. Îro ev derfet heye. Berî her tiştî armanc. Ew şaxên ku di çanda kurdî de



li cihêkî pêşketî û li cihêkî lipaşmayî, an jî şaxek heye, yek tune ye, wilo nabe. Divê di vê navenda xwe de em hemûyan bi awayekî paralel û serkeftî bikaribin bimeşînin.

Kurdên pisporekî van şaxan li welatên YDS'ê peyda dibin û piştî kirîna vî gundî em dikarin wan li vî gundî bicivînin. Cihê ku em lê bijîn û karê xwe bikin heye. Derfetên xebatê ji bo me kurdan roj bi roj fireh dibin. Ji ber vê çendê, gundê kurdan navenda çanda kurdî ye. Lewma armanca vî gundî, armanca ke piroz e. Rûniştvanên vî gundî vê armançê dizanin û xebata xwe jî wekî ku em dibînin bêyî rawestandîna dimeşînin. Û em ne tenê ji rûniştvanên vî gundî, ji wan kesên ku dikarin vî karî bikin û xizmeta miletê xwe bikin- çî biçûk û çî mezî- dixwazin ku tevî xebata li vî gundî bibin. Xwe û çanda miletê xwe bi pêş bixînin û li vir, di nav xebatê de cihê xwe bigirin.

*Hûn dikarein, xwe bi me bida nasîn û tu li vî gundî çî karî dikî?*

**İnga** (hunermend): Ez ji Gurcistanê hatime vî gundî. 15 salan min li ser muzîkê xwendîye. Bi taybetî li ser enstrûmanên violonçello û piyano xebata min heye. Armanca min ew e ku ez di vê dema zehmet de alîkariya gelê xwe bikim. Ji ber vê yekê ez hatime cem miletê xwe.

Ez dersên muzîkê didim zarokên me. Xebata xwe jî niha ez li ser muzîka klasîk a kurdan dikim. Divê hemû muzîkvanên kurd muzîka klasîk nas bikin, ku bikaribin li ser bîngeheke rast bi pêş bîkin. Heya îro me kurdan nikaribû ku em li hev bicivin, ev gundê rê li pêşîya vê yekîtiya hunermend û rewşbîrên me vedike. Ji ber vê yekê, divê kesên ku ev kar jî destên wan tê, bi alîkariya hev, vê pêşketinê li vî gundî çêbikin.

*Te berê hay ji kurdan hebû?*

**Min** kurd nas dikirin, lê min nizanibû kurdî çî ye? Ez dîrî çand û dîroka xwe bûm.

*Tu kurd î yan êzîdî yî?*

**Berê** min digot ez êzîdî me. Lê niha dibêjim ez kurd im, dîne min êzîdî ye. Kurdê ku dixwaze xwe bêhtir nas bike û xizmeta miletê xwe bike, divê dîroka Kurdistanê hîn bibe û tevî xebatekê bibê. Divê em bizanibin kurd kî ne?

*Hûn dizanin bê niha li welêt çî diqewime? Şer ji bo çî û bi kê re tê kirin?*

**Belê**, pir hindik ez dizanim. Hêdî hêdî ez dibihîzim û nas dikim. Şerê PKK'ê em hişyar kirin û quwetê dide me, ku em bi hev re bikaribin bimeşin. Kul û derdê me yek in, em dikarin bi ser bikevin, di her warî de. Em jî kesî ne kêmtir in!

*Armanca we ya pêşerojê ji bo xebata çandê çî ye?*

**H. Sefqan** (hozan, ji Başûrê Biçûk): Ji bo dema nêzik çêkirina hin şahîyan heye. Xebata me ya niha bêhtir li ser zarokan e. Yanê, me giraniya xwe daye ciwanan. Heya kesên ku em ji wan re dibêjin mezin, ew bi xwe jî ciwan in! Ji ber vê yekê xebata me bêhtir li ser perwerdehiyê ye. Niha zarokan dereceyek xelas kirine û çend zarok me dane ser

xebata enstrûmanan. Wekî enstrûmanên çelo, gîtar, piyano, keman, saz û flûtê. Xebata me ya tiyatroyê jî bi kêmasî be jî dimeşe, lê ji bo xebateke baş em li benda mamosteyê tiyatroyê ne.

Di nav xebatên me de, çêkirina kasetên muzîkê jî heye. Xurtkirina studyoya me ya televîzyonê û programên ji bo televîzyonê yên cur bi cur jî hene. Armanca me ya yekemîn, belkî demeke dirêj bikişîne, lê em dixwazin kadroyên çandê yên neteweyî bigihîjînin. Em dixwazin orkestrayekê saz bikin. Wê ev yek zehmet be, hema ev bawerî û derfeta me heye.

*Ji bo xebata çandê, derfetên welêt û yên vir hûn çawa dibînin?*

**Deff** (hozan, ji bakurê Kurdistanê): Li gorî min ferqa mezin, li welêt germa-ya milet heye. Em wê germahiyê li vir nabînin. Ew germahiya welêt zewqêkê dide mirov. Ez bawer dikim ku emê bi xebat û berhemên xwe wê germahiya welêt binin vir jî, ji aliyê me ve jî sistiyek heye, ev jî tesîra derveyî welêt e.

Îro çiqas derfetên xebata muzîkê hebin jî, ji ber kêmbûna moralê, di netîceyê de kêmasî hene. Belê, em heya dawiyê bi armanca xwe ve girêdayî ne, ku bîngeha çanda neteweya xwe li vir xurt bikin. Çawa ku tesîra sistiya derveyî welêt heye, em dikarin bi hesreta welêt, vê sistiyê bikin, bîngeha xebata jî bo vege-

gavê divê mirov hunermendiya hunermendan nîqaş bike!

**H. Sefqan**: Berî her tiştî ev bi jiyandê ve girêdayî ye. Hunermend bi problemên bi welêt re najî. Loma morala wî/wê dişikê. Bixwaze nexwaze bandora wê yekê ya psîkolojîk heye. Ji ber vê yekê ew hunermend qels û jar dimîne û nikare ji wan derfetan feydeyê bibîne û bi pêş bixîne.

*(Di vê navberê de, "Koma Kurdistan" ji Kazakistanê hatibû gundê kurdan, ku xebata li vir bibîne û ji xebata xwe re bike wekî bîngeheke zanistî û neteweyî. Me ji wan jî pirsek kir)*

*Koma Kurdistan, ev çend sal in xebata xwe didomîne û armanca wê çî ye?*

**Ev** sê sal in ku em xebatê bi komî dimeşînin. Bi taybetî li Kazakistan û Asya Navîn em li ser çand û muzîka kurdî dixebitin. Armanca me ew e ku em êş, derd, kul û şahîya miletê xwe binin zîman. Her ku em xwe û welatê xwe nas dikin, bi hişyarkirina PKK'ê ya li Kurdistanê û li derveyî welêt, em jî li cihê xwe xizmetê dikin û li bersiva pirsê "Em kurd çima ew qas ji welatê xwe dûr ketine" digerin.

### Dublaja filman jî li vî gundî tê kirin

*Hûn li vir karê televîzyonê dikin. Ji bo pêşerojê çî amadehiyên we hene?*

**R**ûsya pêşketinên li welêt jî nêzik ve dişopîne. Li parlamentoya Rûsyayê problema kurdan gelek caran hate nîqaşkirin. Heya civîna PKDW'ê li parlamentoya Rûsyayê hate lidarxistin. Van dawîyan protokoleke pir gir girîng di nav kurdan û Rûsyayê de hate îmzekirin. Ev protokol û xalên vê protokolê, wê di dema pêşîya me de bêne daxuyandin.




Davê Nazê

ra welatê xwe!  
Helbet li welêt rewş cuda ye, tenê tu dibêjî ezê li hemberî dijmin çawa karê xwe bikim? An jî ezê çawa bistrêm, ezê çawa neyem girtin? Kuştin û îşkence li hêlekê! Li vir ev tune ye. Mirov dikare xwe bêhtir bide ser xebata çand û hunerê.

*Li gorî we gelo çima hunermendên li derveyî welêt di warê zanistiyê de xwe bi pêş naxînin?*

**L**i gorî min ev kêmasiya hunermendan e. Ez difikirim li Tirkîyeyê ev derfet tune bûn, lê mirov bi pêş diket. Hema li derveyî welêt ew qas derfet hene, tew hunermend nexwaze wan bibîne jî. Wê



**Aras** (teknîsyen, ji bakurê Kurdestanê): Wekî ku hevalan jî behsa xebata çandê kir, armanca me jî di warê televîzyonê de bîngehek e ku karibe bi her awayî programan çêbike. Em dixwazin xwe li vir organîze bikin, ku rojekê tişteke hate serê weşana MED-TV'yê, em bikaribin li vir wê weşanê bidomînin. Belê, niha xebata me bi giranî li ser karê dublaja filman e. Lê ji bo pêşerojê jî amadehiyên xwe em tu carî jî bîr nakin. Û di demeke kin de emê dest bi çêkirina programên muzîk, panel, filmên dokumantal û hwd. bikin.

*Li vir piraniya zarokan bala mirov dikîşîne. Wekî ku li jor jî hate gotin gira-*

*niya xebatê li ser zarokan e. Berî her tiştî çima zarok û hûn çî didin zarokan?*

**Şevîn** Civaknas (sosyolog): Bi gotîneke klasîk, zarok pêşeroja me ne. Lewma em mecbûr in ku giraniyê bidin ser zarokan. Ji hev belavbûna civaka xwe, em dikarin hîn bêhtir di şexsiyeta zarokên xwe de bibînin. Îro li vî gundî her zarokeke me ji nav dewleteke din hatiye vir û psîkolojiya wan ji hev cuda cuda ye. Yanê kurdîtiya wan hatiye parçekirin. Ji bo ku ev zarokên me bikaribin li kurdîtiya xwe vegerin, xebatên me yên din wê hemû bi avê de herin. Yek bûye rûs yek bûye gûrc, yek bûye tirk, yek bûye kazak. Ji ber vê jî niha em giraniyê didin ser dîroka Kurdistanê û zîmanê kurdî.

Bi taybetî jî em zehmetiyê di alfabe-yê de dikîşînin. Ji ber ku her zarokekê me bi alfabeke cuda (kîrîlî, erebî, filekî) hatiye perwerdekirin, hînkirina alfabe-ya latînî pêşiyê jî wan re giran hat. Lê hêdî hêdî hîn dibin. Û her wiha xebatên wan yên muzîkê, tiyatroyê, folklorê jî berdewan in. Her dersên şaxekê, mamosteyek dide.

*Zarok diçin dibistanên rûsan jî. Rewşa wan a li dibistanên rûsan çawan e? Gelo hem dibistanên rûsan û hem dersên li gund, ji bo zarokan ne giran e?*

**Rewşena** Bedir (mamoste): Bi rastî berî ku em wan bişînin dibistanên rûsan, em ditirsyan. Me digot ewê nikaribin di bin vî barî de rabin û wê di tîkiliyan de zehmetiyên bikişînin.

Di nav van çand mehên derbasbûyî de em dibînin ku zarokên me ji mamostayên xwe ên rûs, xelatên serkeftinê distînin û bi vê re, di xebatên xwe yên di gund de jî pêşketinên balkêş di wan de çêbûne. Ev jî tê wê maneyê ku gava em li ser wan bisekinin zarok dikarin bi barê xwe re rabin. Zarok paqij in û tu çî bidî wan tu wî distînin. Hema mezin ne wisan in, gerek e tu wan biguherîni. Û di şexsiyeta mirovan de jî, li hemberî guherîne berxwedan heye!

*(Me pirsra xwe ya dawî ji direktorê gund Ezîzê Cewo kir.)*

*Gelo tîkiliyên kurd û rûsan, bi taybetî jî yên gund û dewletê çawan e?*

Îro li Rûsyayê problema kurdan tê nîqaşkirin. Rûsya bi kurdên di nav xwe de û li derveyî xwe, di nav diyalogekê de ye. Rûsya dixwaze politikaya xwe ya kurdan çêbike. Û tîkiliyên me û Rûsyayê baş in.

Bi rastî kêmasî di tîkiliyên me û rûsan de hebin jî hêdî hêdî xurt dibin û wekî dosteke stratejîk ev tîkîlî bi wan re têne xurtkirin. Tîkiliyên me û gundên çîran û herêmê jî heya dawiyê baş in. Zarokên me diçin dibistanên wan. Danûstandina me û sazîyên wan yên kulturî her ku diçe ber bi netîceyê ve diçe.

Di warê brokratîk de, tu problemên me tune ne. Di çapemenî û weşanên wan de jî, kurd tene nasandin. Di netîceyê de, her çiqas Tirkîyeyê wê nexwaze jî dostaniya kurd û rûsan a ku ewê her tim hebe, tê avakirin.

\*\*\*

*Belê "Solneçni", yanî "Gundê Rojê", bi hemû kar û xebatên xwe hêviyê dide pêşeroja kurdan.*



# Pirsgirêka entelektueliya

# kurdî



CEMŞİD BENDER

**E**zê hewl bidim ku bi gelemperî naveroka hinek têgînên (terîman) ji jiyana xwe û serpêhatiyên xwe derxim. Ji ber ku tu têgînên sosyolojîk û politîk ne dîrî jiyana mirov in, bi jiyana mirov ve girêdayî ne. Ew di dilê mirov de ne. Lewma ez dixwazim di warê pirsgirêka entelektueliya kurdî de ji ji jiyana û serpêhatiya xwe bi rê bikevim û wê derxim holê. Ancax em dikarin bi riyeke wisa vekirî û zelal bigihîjin hin netîceyan.

Wekî din jî, bi gelemperî mirov dikare ji pirsên wekî entelektuel kî ye, berpirsiyên wan ên li hemberî civakan çî ne, divê çî bin, mirov dikare ji kê re bibêje entelektuel? bi rê bikeve wê mirov karibe zelaliyekê ji pirsgirêka entelektuelan re bîne. Lê, em dizanin ku ev di dema me de, di hundirê perspektîveke fireh de hatine munaqesekirin. Der heqê vê yekê de bi koman pirtûk û gotar hatine nivîsandin. Em dixwazim di vê nivîsa xwe de li ser pirsgirêka entelektueliya kurdî, ku gelekî hindik li ser tî axaftin û her tim di plana dawî de dimîne, rawestim. Wê nivîsa me, bi entelektuelên kurdî ku di nav tixûbên Tirkiyeyê de ne, bi sînor be.

Li vî welaî berî her tiştî şertên "entelektuelbûnê" pîr giran bûn. Hemû dibistan di bin rayedariya sistemeke yekpartîtiyê de bûn. Hemû weşanên ku derdiketin, bi fikra jiyandina zîhniyeta rayedaran derdiketin. Wan jî entelektuelên ku bi partiye û bi dewletê ve girêdayî ne, derxistin. Ev celebe entelektuelî paşê di nava xelkê de bi navê "Vatan millet Sakarya" bi awayekî karîkatorîzekirî hate navandin. Têkiliya ku pêşî bi kultura Rojava re hate danîn, di dema "Wekîle Maarîf" (Wezîrê Perwerdehiyê) Hasan Alî Yücel de dest pê kir. Hinek berhemên girîng bi alîkariya vê wezîriyê li tirkî hatin wergerandin. Di wê demê de hejmarê kesên ku xwendin û nivîsandina wan tune bû, digihîştê ji sedî heştêyî. "Ensîtuyn Gundan" ku riya entelektueliyê vedikirin, ji aliyê wezîrê eynî partiyê Reşat Şemsettin Sirer bi suçdarkirina ku ew propogandaya komunizmê dikin, hatin girtin.

Li gelek gundên kurdan dibistan tunebû. Xertên kurdan li leşkeriyê hînî tirkî dibûn. Ji ber ku wê denî hemû we-

**Sir û sêhra ku em anîne ba hev, têkoşîna gelê me ya demokratîk e. Ger ev têkoşîn nebûya wê di navbera me de jî ev pevgerêdana hezkirinê tune bûya. Meyê qet hev nas nekira. Çendî bi derengî be jî, di warê edebiyat û politîkayê de êdî tîpekî entelektueliya kurdî şêkil distîne.**

şan; pirtûk, kovar û rojname bi zimanê tirkî bûn, hinek kurdî di medreseyan de ku bi awayekî veşarî çalakîyên xwe dikirin, li riyên zanebûn û hişyariyê geriyane. Di demeke ku peyivîna bi kurdî qedexeyê bû û kurdî qaçax bû, avabûna entelektueliya kurdî dîrî aqilan bû. "Xwezî bi yê ku dibêje ez tirk im", hê di wê demê de li ser çiyân, li ser riyân dane nivîsandin.

Di navberê de tam 73 sal derbas bûne. Hebûna gelê kurdî, zimanê wî, dîroka wî, stranên wî bi riya têkoşîna kurdan a bi salan dîsan hatiye holê. Xebatên zanistî bi pêş ketin. Digel vê, mirov dikare behsa entelektueliyê kurdî ya gelekî derengmayî bike.

Em di nav çerxa perwerdehiya serdestan de ku bi zorê empozeyî me dikirin, bûne entelektuel. Di dibistana seretayî de em bi gotina "Tirk im, jîr im..." diketin sinifan. Em bi sloganên "Tirk bipesine, bixebite, bi bawerî be" mezin bûne. Wan tu agahî û zanebûneke ku bi gelê me ve girêdayî be, nedan me.

Ez mîna zarokêkî koçber (mihacir) li Qonyayê hatim dinyayê. Min li wir xwend. Di dibistanê de tu zehmetiyên me çênebûn. Lîseya Qonyayê bi serê xwe navenda neh wîlayetên dorhêlê bû. Zarokên ku ji wîlayetên din dihatin, di-viyabûn lê razana (yatlı). Bêdibistanî problema hemû Anatoliyayê bû. Qet guh nedidan vê mijarê. Bi qasî tirkan kurdan jî para xwe ji vê rewşa neyînî distandin. Di dema me de nivîskar û şairên ku navdar bûn ev bûn:

M. Emin Yurdakul, F.Rıfka Atay, Halide Edip, Orhan Seyfi, Yusuf Ziya, Reşat Nuri Güntekin û Ömer Seyfettin.

Di qada weşanê de jî, Burhan Felek, Va-La Nureddin, Peyami Safa, A. Emin Yalman û H. Cahit Yalçın serî dikişandin. Ev hemû tê de, bi taybetî jî xwediyê kovara "Varlık"ê Yaşar Nabi, ji bo ku îdeolojiya kemalîzmê bide dewamkirin, pîr dixebitîn.

Di vê hengameyê de gotina "kurd" hiç nehat bikaranîn. Ji binî ve hate înkarkirin. Hate tunekirin. Ji ber zilmê û zora ku dibû, ez hînî zimanê xwe jî nebûm. Gava di nava civatê de bixwestina min bi hinekan bidin naskirin, digotin: "Lawê Şebriyê kurd." Lê eger min "Ez lawê Şebriyê kurd im" bigota, wê ez rexne bikirama û bigotana: "Ev peyva kurd jî ji ku derket?"

Ev heftê sal in ev durûtî berdeyam e. Entelektueliya kurdî, derketina entelektuelên kurdan di şertên gelekî zehmet de pêk hatiye. Me pîr bi derengî Serhildanên Çiyayê Agirî, Şêx Seîd, Dêrsimê bihîstin. Em pîr bi derengî pê hesiyan. Bîrêveberiya kemalîzmê em ker û kor kiri-

bûn. Me ev agahî jî, ji kesên ku sirgûn bûbûn dihişt. Ragihandin (komûnikasyon) pîr hindik bû. Eger dinya xerab bi-bûya, haya kesî jê nedibû. Sazûman û pergal wilo bû.

Min entelektuelê kurdî ê pêşî, di sala 1948'an de li Girtîgeha Afyonê dît. Ez wê demê li Stenbolê diçûm sinifa duduyan a fakulteya hiqûqê. Bavê min ji bo nûrcitiyê hatibû girtin û ew xistibûn girtîgeha bajêr. Ez tam bi hejmara wan nîzanim, lê bi texmîna min 60 nûrcî bi hev re girtî bûn. Bedûzeman Seîdê Kurdî şal û şapik li xwe dikirin. Wî ew kincên xwe yê dîrokî di salonên dadgehên de jî, ji xwe nedikirin. Xweparêziyên wî yê li dadgehên, mîrxasiya wî û hezkirina ku nîşanî şagirtên xwe dida, zanebûna wî ya kulturî, nîşana entelektueliya kurdî bû.

Eger ez tesîra vî entelektuelê kurdî li min, bigirim ber çavan û van bibêjim:

Bedûzeman Seîdê kurdî bi her awayî li dijî îdeolojiya kemalîzmê bû. Wî pîr jî gelê xwe hez dikir. Lê piştî ku wî serhildanên Diyarbekir û Dêrsimê dîtibûn, hêviya xwe ji binî ve winda kiribû. Bi gotina wî, wî "Seîdê Berê" danîbû aliye-kî û kirasê "Seîdekî nû" li xwe kiribû. Ew di riya dîn de diçû û dixwest ku ew zikê rejîmê yê nerm biqelêşe. Lê wê ev fikra wî di şertên nûdem de tu netîce nedaya. Ez qet bawer nakim ku îro di têkoşîna demokratîk a gelê me de pareke wî hebe. Berî despêkirina tevgerêkê bi demeke dirêj a ku tesîrê lê bike, heye. Lê mirov nikare sifateke wiha bide Bedûzeman. Wî hemû jiyana xwe li sirgûnê û li girtîgehan bihurand, lê hemû daxwaza wî bi avakirina sistemeke îslamî, bi sînor ma.

Ez dixwazim behsa entelektuelên kurdî ên hemdemê xwe jî, ku min ew nedîtine, bikim.

Ez dikarim bi kurtî van navan bihejmêrim: Nûrî Dêrsimî, General Îhsan Nûrî Paşa, Kamûran Bedirxan, hozanê navdar Cegerxwîn û Nûredîn Zaza.

Ën ku ez gihîştim rûmeta naskirina wan jî şehîd Musa Anter, şehîd Huseyin Deniz, Îsmet Şerîf Wanlî, şair Abdurrahman Durre, Feqî Huseyn Sağniç, Mele Îsmet, Yaşar Kaya, Selîm Ferat, Huseyin Kartal, Haydar Işık, Mehmet Uzun, Firat Cewerî, Ethem Xemgîn, Süha Bulut, Mehmet Bayrak, Serdar Baran, Lütfî Ballıkaya, Dr. Huseyin Nazlı û B. Duran Şeker.

Ev e, piştî ku ez bi salan dîrî pirsgirêka kurdan jiyam, ez gihîştim rûmeta naskirina van entelektuelan û bi wan re bûm heval. Sir û sêhra ku em anîne ba hev, têkoşîna gelê me ya demokratîk e. Eger ev têkoşîn nebûya wê di navbera

me de jî ev pevgerêdana hezkirinê tune bûya. Me yê qet hev nas nekira. Çendî bi derengî be jî, di warê edebiyat û politîkayê de êdî tîpekî entelektueliya kurdî şêkil distîne. Li welêt û bi taybetî jî li Ewropayê kovar û rojnameyên bi kurdî tene weşandin. Yê ku di van weşanan de berhemên nivîskar û şairên me diweşînin, ne bi tenê di warê ziman û edebiyatê de keda wan çêdibe, her wiha di warê gihandina entelektueliya kurdî de jî kedeke wan ya bêhempa çêdibe. Ew yeka hanê mirov pîr kêfxweş dike.

## Di pirsgirêka entelektueliya de hin neyînî

Entelektuelên welatên bindest, ji ber perwerde û terbiya ku ji serdestan distane, gelekî di bin tesîra wan de jî dimînin. Pêdaneketina pirsgirêka neteweyî, celeb entelektuelan bi hêsanî bermenfeetê ve diajo. Bêsexsiyata ku ji karkirin û qedexebûnê hatiye pê, carin bi kêrî van celeb entelektuelan tê.

Nivîsa nivîskarê pirtûka Ehmedê Xanî, hevalê min Medenî Ayhan, a derî qê entelektuelên kurdan de min gelek dide fikirandin:

"Entelektuelên kurdan li hemberî jahiyên gel sar û bêberpîrs in, ew ji bîrdêdayîn û ji riskê direvin, jê ditirsînin. Risk tu carî danakeve sifirê. Entelektuelên kurdan li bendî ne ku risk dakeve sifirê. Ev kesên hazirxur in, şîretkar û bi navê rexneyan tiştên ne qenc dibêjin. Ev genî ne, şer nakin, êrîşî derewîn, heq û neqencan nakin, ew li du feydeyê xwe û hesaban in.."

Nivîskar bawer nake ku wê bi entelektueliyê wilo ronensans çêbibe, pêwistiya celebêkî nû yê entelektuelî dibîne. Bêyî ku em tu şîroveyê li ser dîtina Medenî Ayhan bikin, em wê dîpêrin xwendevanan.

Em li ba hinek entelektuelên me neyîniyê dibînin. Jixwe em naxwazim nêrîna jor gelemperî bikin. Ya ku me rî pîr xemgîn dike ew e ku, hin der û din hin kesan derdixin û berî pêxîla kerdinê ku li ser kultura me, edebiyata me dîroka me û zimanê me lêkolînan didin. Ew dixwazim ku ji van nivîskaran lêkolînerên me re bibin kelem. Rewe wilo di demên biserxwevehatina gelemperî bindest û hişyarbûna wan de derdikeholê. Em hêvîdar in ku di demeke wê de ku tevgera entelektueliya kurdî li geshbûnê ye, wê pêşî li hemû neyîniyên were girtin.

\* Ev nivîsa Dr. Cemşid Bender pêşî Nûdemê de hatiye weşandin. Piştî Dr. Cemşid Bender ev nivîs ji me re jî şand. Me tîpê li gorî qayde û vekîta xwe dest li wê gerra Nûdemê gerandin.





Li Navendên çandê çalakîyên ve hefteyê  
Li Navenda Çanda Mezopotamyayê şaxa Stenbolê  
● 12.1.97 **Yekşem**: Dîlan, Koma Serhildan û şeva hinê saet: 17.30  
● 15.1.97 **Çarşem**: Semîner- Dildar şeko: Pêşveçûna helbestên  
Kurdîstana Başûr û mînakên ji wan, saet: 17.00  
● 17.1.97 **În**: Konser: Bilgesu Erenus, saet:17.30  
● 18.1.97 **Şemî**: Konser û danîşana dia: Koma Agirê Jiyân û  
rêvengiyêke dirêj, ber bi Munzur ve, saet: 14.30  
Li Navenda Çanda Mezopotamyayê şaxa İzmirê vê hefteyê  
● 12.1.97 **Yekşem**: Şeva çîrokanên kevneşopî, Apê Resul, Ahmet  
Taş, Seyid Abdulkaki, Hasan Cezmi, saet:16.00

● 17.1.97 **În**: Konsera Koma Çiya, saet:18.00  
● 18.1.97 **Şemî**: Şeva piştigiriya xwendekaran-Koma Çiya  
saet:17.30  
**Li Evrensîal Kûltûr Merkezi**  
● 12.1.97 **Yekşem**: Muzîk:Dost Ezgi, gotûbêj: Çapemenî û  
welatparêzî saet:16.00  
**Li BEKSAVÊ**  
● 12.1.97 **Yekşem**: Bi çavê geştvanekî rojavayî, rewşa Başûrê-  
Rojhilat (Batılı bir gezginin gözünden Güneydoğu izlenimleri)  
Gültekin Tekin, saet:15.00

## RÛDAN

# Mala çandê ya jinên kurd



Heta niha xebatên xwe bi navê "Koma Jinên Kurd a Azadî" di-domandin. Ji ber ku peyva "Azadî" nehate pejirandin, çalakîyên wan ji aliyê dewletê ve hatin qedexekirin. Avakirina komê bi seredana navê "Jiyan-Mala Çandî ya Jin" hate qebûlkirin. Vê saziyê roja 5'ê rêbendana 1997'an bi merasîmekê li cihê xwe yê Beyoğlu avabûna xwe daxuyand. Di merasîmê de Serokê Kürt-Kav'ê Yılmaz Çamlıbel, Cîgirê Serokê Giştî yê DBP'ê Yavuz Koçoğlu û kesên ji Mor Çatî, Koma Eksik Etek û Egitim-Sen'ê hin kes beşdarî merasîmê bûn. Stranbêjê Aynur Doğan jî konserek da.

Me, ji avakara komê Necla Feroğlu armanca wan pirs kir. Feroğlu jî diyar kir ku armanca wan çareserkirina pirs-girêk û astengên li ber jinan, bi taybetî jî yên jinên kurd e. Wê da zanîn ku ewê bi dorfirehî ji bo mafên hemû jinan bixebitin. Wê got: "Îro jinên kurd bi dîroka xwe nizanin, weşanên der heqê dîroka jinên kurd de bi zêdeyî nîn in. Dewlet heta niha dibêje; 'hûn tunene.' Lê belê em hene û niha em li vir in. Kurd li hev civiyân û dixwazin lîkolîna vê babetê bikin."

Ji avakaran Nevin Il jî diyar kir ku ew bibêjin ev mal ji bo hemû jinên kurd e, ewê bikevin xeletiyêke mezin. Nevin Il got: "Ev mal ji aliyê hinek jinên kurd ve hatiye avakirin. Ev cih wê rê li ber avabûna saziyên bi vî rengî yên jinên din jî veke. Bi ya min Koma

Jinên Kurd a Azadî, bi avakirina Jiyanê, peywîra xwe bi cih anî.

Daxwaza me ew e ku bi taybetî jinên kurd li vê malê xwedî derkevin û em banga hevkarîyê dikin. Li vê derê, ji bo ragihandina arîşeyên jinên kurd ji bo raya giştî ya cihanê bila xebat bînin kirin. Belê digel vê yekê jî, ji bo pêşdeçûm û têgehiştina jinan wê xebat bînin kirin.

Helbet tiştê ku rojeva me ya sereke dide xuyakirin jî, şerê ku li welatê me didome ye. Li dijî şerê ku li welatê me didome, em dixwazin gavên ber bi pêkanîna eniya aştiyê ya jinan bînin avêtin. Ev sazî bi serê xwe mîsyona bangawaziya vê yekê hildigire ser milê xwe. Emê li dijî şerê qirêjî bangî hemû jinên li Tirkîyeyê bikin ji bo pêkanîna eniya aştiyê ya jinan."

Li ser pîrsa me ya bi rengê "Tu sazî yan rêxistinana piştigiriya we kirin?" Nevin Il dibêje: "Na tu sazî an rêxistinana piştigiriya me nekirin. Ji xwe ev pênc meh in ku me dixwest em "Jiyanê" vekin. Ger me alîkarî stanibûna ne pênc mehan di navbera mehekê de me yê vekiribûya. Ji ber astengiyên aborî me nikaribû. Hevalên me bi dest kampanyayê kiribûn, bi alîkarîya kampanyayê "Jiyan-Mala Çandî a Jin" vebû. Me nexwest ku ev mal girêdayî kesî be, me xwest ku em cihêkî ku hemû jinên kurd karibin xwe lê îfade bikin ava bikin."

AZAD ALTUN

## TÎŞK

LERZAN JANDÎL



## Sera şima wa newiyê pîroz bo

Bêguman her kesê bi hêviyanê newiya, ebi armancanê rindan wazeno, ke bikuyo sera newiye. Naye de jî gor her ca û kewan edet û torê, lex û kêf, kay û şahîyî estê.

Ma de verde vatêne "Kalo Gaxan". Pêniya aşma çelewî de xortêde dewe xo kerdêne kal. Yanê kewtêne şiklêde kalî. Seba naye jî kincê diriyayî û hîrayî dêne xo ra. Vaş kerdêne vêre û pê mîyanê xo, ke hem kal biaso hem jî xaşiya xo (vêre xo) xurt biaso. Herdîşêde sipiye teba zimêlan viraştêne teba çuyêde qalind dêne re kalî dest. Kalî nelerî (tofanî) ardêne xo ser. Miya xo ebi cîman girê dêne, cîm pilêsnêne re sarê xo. Lexiya ke mordemî demo normal de nêkerdêne, qesa ke mordemî demo normal de nêvatêne, kalî na roje kerdêne û vatêne

Bêguman kal teyna nêbiyêne. Ci rê yew pîreke lazim biya. Xortanê dewe ra yew xort jî kewtêne dilqê pîreke. Pîreke zaf şermoke biye. Eke kesê ci ra persê bivatêne yan jî dest bieştene ci, şermê xo ra remêne kewtêne pê kalî.

Xêca kal û pîreka dê, xortê dewe jî Kalê Gaxanî de gêrêne. Kal dewe de çê bi çê, qe ferqe ci nêkerdêne, feqîr- dewletî, weş- nêweş, kal- xort, gêrêne. Her çê de angorê hal û demê kewanê nê çeyî kal afatî vetêne. Pêniye de nê çeyî, vaş, ron, ardî, perdir, sole, bi kilmiye dest de çike bi, dêne kalî. Xortanê dormê kalî no çimî yew çê de dêne are. Meselaya kalî û şarê dewe heystê dewam kerdêne. Eke çeyê dewe qediyayî, naray jî xortan ya çimîyo ke do arê, rotêne û ebi peranê dîne heqê hunermendan dêne, yan jî dê ra wer kerdêne hazir. No kar ke qediya, vengê dawul û zurna dêne. Eske dewe de yan jî dewanê dormî de dawul û zurna çinebiyene, vengê dengbêjan dêne. Dewe de govende dest kerdêne ci. Govende ge gane hawt rojî dewam kerdêne. Dewê dorî pêro amêne na dewa ke tede govende esta.

Hed û hesabê şahîyan çinebî. Şewanê zimistanîyê dergan de kêf, eşq, kay, lexî şodrane jî mobet bî. Şarê der û dorî nêzdiy ere yewbîni biyêne. Zaf mordên ke wetê xo çinebî, amêne were. Bi kilmiye şar-ebi eşq, kêf û leqî kewtêne sera newiye û ebi na qeyde jî sera kanê, cîm û karê dayê giranî xo vîra kerdêne.

Nê edetê ebi asimilasyon, ebi dewe ra dûrî kewtene, ebi pêwendiyên kapitalîstan amê xo vîrkerdene. Hema wunciya jî bî.

La belê ewro niya niyo. Hetê ra şero qilêrin û neheq, hetê ra çeteyî, ke biyena nînan teşkilat-i Maşûsa ra dest kerdo ci, Koçgîrî, Şêx Sait û Dêrsim de dewam kerdo û ewro jî tayîna profesyonel, tayîna qilêrin xebetîne, hetê ra mafya, hetê ra zulm û zor, îşkence, dewan talkerdene, hetê re biran-vêşnayene şarê ma kerdo halêde henên, ke ne kêf û eşq verî mendo, ne jî naye re demê xo estê û armancê de xo yo niyanên asto.

Wunciya jî ma bawarîme, ke nê tengî, no şer, nê çeteyî û mafya rojê ênê qedênayene. Şarê ma hurîndiya nînan de azadiye, aştiye, biratiye û sêyewbîniye ano welatê ma. Ebi na hêviye ez vanê: Wendoxê rojnamaya ma, ez sera şima wa newiye pîroz kena û wazena, ke na sere, şarê ma rê, şaranê bîndestan rê, bibo sera aştiye, biratiye û weşiyê.



# Berbangga gulebarankirî

**P**îra Pêrûza li keviya Camiya gund dûniştîbû, li pêtên agirê ku leşkeran berdabû xaniyan dinêrî digot: "Li min porkûrê, li min rebenê! Min qiyamet jî bi çavên xwe dît." Bi çavên heyirî, dilekî tijî keser li xaniyê ku bûkaniya wê, dilxweşî û jiyana wê ya bextreş tê de borîbû temaşê dikir. Janên salan di nav agirê gur de dikizirîn.

Pîrê rahişte darê xwe yê ku di cihê gopal de bi kar tîne û berê xwe da Şikefta Cinan. Bi pitepit libên tizbiya xwe kişand, çî nifirên ku dizanibû yek bi yek kirin.

Xweliya ku ji xanî, kadin û koxên şewitî radibû girte ser rezên teniştê gund. Ji malan mişk û koremar ber bi zeviyê genim ve dikişiyên. Dûyê reş, pêşiya rojê digirt, dikire wekî danê êvarê. Bêhna kizirê pozê mirov dişewitand. Heç ku rovi bikeve hundirê kozikê, mirîşk bi qijemîj ji pêtên êgir direviyan.

Malbata Pêrûza Evdî hûremûrê ku ji sotinê filitîn, hespê boz, du çêlek, çend mîh û çend mirîşk û pisîka çavşîn birin gundê kirivê xwe. Çend rojan li wir man. Dawî li kamiona ku ji navçeyê hatî siwar bûn, li mala welatparêzekî man.

Pêrûza xêr ji mêrê xwe nedîtîbû. Kurê wê Ezdîn hê li destê wê bû, zîlamê wê Birho di pevçûna nav gund de hatibû kuştin. Hem dêti hem jî baviti ji Ezdîn re kiribû. Dema Ezdîn kete sala şanzdehan keça xweha xwe jê re anî.

Ezdîn bavê du keçan û lawekî bû. Navê her sê zarokên wî jî, "yên li derve" li wan kiribûn. Ezdîn bi xwe û bi hermeta xwe ve gelek suxre ji şervanan re kiribûn. Çiqas rojên reş, zor û tijî astengî derbas kiribin jî li ber çavên wan xuya nedikir. Piştî ku danûstandina wan bi şervanan re çêbû ew hînî hezkirin û mirovahiya ji dil bûbûn.

Malbata Pêrûza serpehatiyên xwe û çend qiruşên heqê sewalên ku hatin firotin, kirin tûrikê xwe. Trena reş wekî marekî çivanok deşt û newalan li xwe badida. Pîrê, di vagona trenê de çiroka gamasî ji neviyên xwe re digot. Jina Ezdîn Fincê şariya xwe ya reş dabû serê xwe. Devê wê jî hev venedibû. Ezdîn hilmek ji cixara xwe kişand û got: "Dinya bi dor e, ne bi zor e. Helbet ro-

jekê emê li gundê xwe vegerin."

Pîra bêdiran bi awayekî ku jê nayê fêhmkirin got:

– Lawo de dev ji van kelevajiyên berde. Wele di jiyana xwe de çavên te êdî bi gund nakeve. Ew der hemû ji He-moyê Qoriçî re man.

Li taxeke li teniştê Edeneyê bi cih bûn. Xaniyê ku kirê kirin di şeklê demançê de bû. Odeyek û salonek. Karê wan yê pêşî, bû çêkirina tenûrekê. Dawî çend çûçikên mirîşkê yên ziraetê kirin ji bo ku xwedî bikin.

Ezdîn piştî roja ku ling avêtin vî bajarî, roja duwemîn bi pismamê xwe Elî re, ji bo ku di çêkirina avahiyan de bixebite, riya erasa karkeran girt. "Küçük Saat", cihê ku karker keda xwe lê difroşin e.

digeriyan, xebatkarê eniyê got:

– Heval tu xwe pir reht de dikî. Hewce tune ew qasî tu xwe biwestinî.

Xebatkara eniyê bi zarokan şa dibû, henek li wan dikir û digot:

– Hevalino hûn dizanin ku navê cejna me ya ku tê çî ye?

Zînê berî Berfîn û Baran got:

– Ma kî nizane, Newroz e.

Baran jî zanîna xwe ya der heqê Newrozê de anî ziman. Dayika wan bi kêf û hinekî fedîkoyî destê xwe da ber devê xwe û kenîya. Got:

– Berfîn, keça min ka strana "Kızıl güller açınca" ji hevalan re bêje. Piştî ku şiv xwarin, li pey hev sê endamên din jî hatin, mazûvan li salonê rûniştin, mêvana di odê de civin çêkirin. Ez d i n

Çaya xwe vexwarin, sê ji wan rabûn, şevbaş dane hev, serkeftin ji hev re xwestin û li pey hev derketin.

Bêbext, ji deng û roniyê direvin. Di quncika herî reş û hêwî de fêl û rîpan dihonin. Nikulê wan le mêjiyê bêhnpak digere.. Ji bo ku deqa lanetbûnê ya li ser eniya wan neyê dîtîn, her tim plangeha wan kêzîn û kavi in. Ji mirovan û rojê dûr.

Şeveke tarî bû, tarî bû heta tu bêji bes. Yek li stêrk li ezmên tune bû. Ji xeynî dengê çirçirkê his tune bû. Bajar di xewê de bû. Gaveke din karkeran vardiya sibê wê nobet biguheranda. Dengê banga sibê wê ji hoparlorên mizgeftan, kalên ku ji zû de li bendî ne dawetî limêjê bikira.

Garaneke erebe, du kolan ji mala pîra Pêrûza wir de sekinîn. Yê ku tirkiya wî xirab e, simbêl mezin, rûlewaz, çavşoqil ji toroseke sor peya bû. Da pêşiya polîsên sivil, cixareyek malboro vexist. Rengê wî zer, mîna biyokê bû. Got:

– Ha ev e mala Ezdîn. Reqearêqa fişkan digihîşt ezmên.

Cîranan, di ber keviya perdê re, bi dizîka dixwestin tiştê ku di qewime fêhm bikin.

Polîsa jin got:

– Puştîno! Serê xwe bikişînin ji ber pacê. Lê yek berik wê mêjiyê we jî belav bike. Qey hûn jî dixurin.

Pîra Pêrûza û bûka xwe di hundirê metbaxê de, zarok kiribûn dawa xwe.

Dîsa nifir kir:

– De bila zilma we pir be da ku dawiya we zû bê.

Mirovên ku di reşiya sibê de diçine kar, yek bi yek ji mal derdiketin. Qirî-nên serxweşên ku ji restaurant û bîrexaneyên bajêr vedigeriyan, guhê mirov diqilqilandin. Hêvî û rûgeşî bû dilopên xwînê li rûyê Berfîn û Zînê. Çiqas birîna Fincê xedar be jî, bi hemdê xwe gotin û deng jî dernediket. Bi çavên xemgîn û bêlome li cendekên şervanan dinêrî.

Ezdîn, hec ku di xeweke giran de be li erdê diirêjketî bû. Laşê wî xirimibû.

Baran hec ku lal bûbe, bi awirine bêwate li dora xwe dinêrî. Pîrê di kolana ker de diçû û dihat. Darê xwe bi hêrs li erdê dixist, nifirên xwe didomandin.

– Rebi kezeba we..



Di avahiyên

ku pozê wan ber bi asîmên ve bilind dibe de xwîn û xwehdana karkerên kurd heye. Mutahtî, bi tîrêjên rojê re tîn, wekî ku bikevin nav sewalan, karkeran dineqînin. Yên zexim, pazû qelew û jêhatî tercîh din.

Bi sedan kes ji avahiyan wer dibin, qop dibin, cendekê wan diavêjin ser dolmîşekê, nanekî bi pêşiya dolmîşê ve dikin û dişinin welêt. Yên ku "hatine Edenê, para bibin bi legenê" ji jiyaneke tijî elem, bi ta û bawîbûnê pê de tu tiştî bi ser naxin.

Ev sal û niv e ku Ezdîn jî di karê se-yandinê de dixebite, îşev jî kerixî vege-riyabû malê. Mêvanine wî li ber dilê wî pir ezîz hebûn. Dest û lingên Fincê lê

gote hermeta xwe:

– Keçê tu dibînî rûyê hevalan çiqas geş e. Xwedê zane ji bo Newrozê haziriyeke baş kirine. Moralê wan ji her carî baştir xuya ye. Wê rojê kes naçe kar, bila zarok li ba dapîra xwe bimînin, di-vê ku ez û tu jî herine serhildanê. Belkî heval wezîfeyekê jî bidine me.

Nêzikî nivê şevê qediya. Fincê çay li ber wan danî. Şervanê henekvan, wekî her car devliken rahişt çaydank da ku îskanan dagire. got:

– Hevala Fincê, roja serhildanê tu ji bir nekî, bêrika xwe tije isota Rihayê bike. Polîs molîs bi ser te de werin, bi-reşîne ser wan. Ku têkeve çavê wan, tu dikarî çekên wan jî ji dest wan bigirî.

HESEN ZINAR



Xebateke nû ji Cemşîd Bender

# Mîtolojiya Kurdan-1

**Der barê koka kurdan de em ji du tezan dikarin behs bikin. Tezek dibêje ku kurd ji deverên din hatine li vê cografyayê bi cih bûne û gelên xwecihî tevî hev bûne, di nav hev de heliyane. Teza din jî kurdan gelekî xwecihî dibîne, dibêje ku pêşiyên kurdan gûfî, hûrî, ûrartû, mîtanî, kasît, subarî û med in. Jixwe ku ev raman bê pejirandin, cih ji nîqaşan re namîne ku kurd xwediyê şaristaniya Mezopotamyayê ne.**

**G**otin û tezen li ser kok û binyada kurdan têvel in. Ne kurd bi tenê, biyan bi xwe jî der barê koka kurdan de xwedî gotin û ramanên ji hev cihê ne.

Li gorî hin kesan kurd ji deverên din hatine li welatê ku îro lê dijîn, bi cih bûne. Ew û gelên xwecihî tevî hev bûne, di nav hev de heliyane û di encamê de îro gelekî tîkel û durehî (melez) çêbûye.

Nêrîn û ramana din jî ev e: Kurd ji tu deverî nehatine, dinya ava bûye nebûye ew li cihê xwe bûne. Yanê kurd ji destpêkê ve nîstecih û xwecihê Kurdistanê ne.

Ev raman û nêrîn bi hev re pev diçin, de ka êdî kî kê bi bin kixe.

Li beşê Bakur bi taybetî Cemşîd Bender serkêşiya teza ku kurd ji tu deverî nehatine, dike. Her wiha di vî warî de jî bi wêrekî ramanên xwe derdibe. Bi vê yekê jî dibe armanca tîrên rexneyan.

Bender, berhemeke din jî li ser kurdan nivîsand û di dawiya 1996'an de da weşandin, îcar bi navê "Kürt Mîtolojisi-1" (Mîtolojiya Kurdan-1)

Cemşîd Bender, di pêşeka vê pirtûkê de dadixuyîne ku wê ev xebat ji sê cildan pêk were. Di vê cildê de Bender cih daye mîtosên serdema antîk ku bandora xwe li olên asîmanî (semawî) kirine. Bi taybetî jî mîtolojiya hûriyan ku hikarî û bandoreke gelekî mezin li ya hîtîtiyan kiriye, her wiha efsane û mîtolojiyên peyrewên hûriyan mîtanî, kasît (kaşî) û ûrartûyan jî li gelên cîran gelek bandor kirine.

Nivîskar bi belge û çavkaniyan, li ser mîtolojiyên hûriyan radiweste. Ligel vê yekê, ji encamên kolanên arkeolojîk ên van salên dawî jî sûdê werdigire. Wekî

kolanên li navbera salên 1983 û 1991'ê.

Nemaze, bi kolanên arkeolojîk ên li Newala Çoriyê (li navbera Ruha û Semsatê), eşkerê bû ku jêderka mirovahiyê ya herî kevn Mezopotamyaya Jorîn e. (Li gorî agahî, belge û jêmayiyên heyî)

Zanyar dipêjirînin ku zayîna mîtolojiyê bi çandiniyê (zireetê) dest pê kiriye. Çandini jî pêşî li Mezopotamyaya Jorîn pêk hatiye. Lewma dibêjin ku hîtîtiyan ji hûriyan ev efsane girtine û ji wan jî derbasî gelên Anatoliyayê û ji wan jî gihyaye Yewnana kevn.

Ji aliyê din, efsaneyên ku dikine malê sumeriyân jî, jêderka wan devera Zagrosan tê pejirandin. Wekî efsaneyên afirijî, tofanê, Destana Gilgamêş. Ev gelê (sumer) hanê ku wekî afirînerên nivîsê tê zanîn, li gorî Bender ji Zagrosan daketiye beriyê.

Sedemê ku dibêjin, efsane bi çandiniyê re derketine holê jî ev e: Ziman û bawerî bi vê qonaxê re çêbûne. Alîgirê vê ramanê di cihana zanistê de pir in.

Me di serî de, ji du tezan behs kir, her yek ji wan li gorî xwe kurdan di dîrokê de bi cih dike. Teza ku kurdan gelê xwecihî dibîne, gûfî, hûrî, ûrartû, mîtanî, kasît, sūbarî û medan jî wekî pêşiyên kurdan nîşan dide. Her wiha van gelan jî, wekî peyrewê hev bi nav dike. Dide xuyan ku tev ji eynî gelî ne. Bes navê wan ji hev guhartî ye.

Jixwe ku ev raman bibe serwer û bê pejirandin, cih ji nîqaş, guman û endîşeyan re namîne.

Em vê jî bibêjin ku, lêgerîner, arkeolog, dîrokan û zanyar (bi piranî) tîkiliyekê di navbera wan "gelan" de dibînin yê ku me li jorê nevên wan dan. Gels, li vir ev e: Ew pêşiya kurdan in an na?

Wekî encam em vê bibêjin, çawa ku berhemên

## CEMŞİD BENDER KÜRT MİTOLOJİSİ-1



BERFİN

*Cemşîd Bender, Kürt Mitolojisi-1, 255 rûpel, Weşanên Berfîn.*


Cemşîd Bender ên li ser dîrok, bawerî û şaristaniya kurdan bûn mijar û dabaşên gengeşî û nîqaşan û gelek reaksiyon dîtin, ev berhem jî wisa xuya ye wê rastî helwesteke wisa bê.

Di vê qonaxa bi êş û jan de, di van waran de tiştên ji me re pêwîst in: Bêhnfirehî, hesasî, helwest û şewazeke (uslûbeke) zanyarane, pîvan û metodeke zanistî...

ZANA FARQÎNÎ

## Di nava dijiwariyên vê zivistanê de

DİLBIXWÎN DARA



**Z**ivistan e. Baran dibare. Berfê rûyê erdê spî kiriye. Welatê me, di bin vê berfa spî de wekî bûkekê xwe xemilandiye.

Ciwaniya hemû cîhanê jî nikare zora bedewiya vê bûka me bibe. Belê, em xwediyê vî welatî ne. Li vî welatî me xwe nas kir. Li vî welatî cara yekemîn me navê xwe bihîst.

Li vî welatî me piştî xwe di bin êş û kederan de kul kir. Li vî welatî me xwîn rijand, me canê xwe da...

Bi çavên xwe me dît çawa dayikên me ji ber êşa sungiyan dinalin...

Û li vî welatî me li ber xwe da.

Û berf dibare..

Baran dibare...

Gundiyan me, di bin zilma vê baranê de niha çawa dikarin xwe germ bikin? Zarokên me, çawa dikarin ji ber zilma sermayê birevin, wê xwe li ku derê biparêzin?!

Zivistan e. Li aliyekî baran dibare, li aliyekî şîn digere, li aliyekî keç û xortan bi destên hev girtine û dîlanê digerin...

Lê belê li aliyê din jî, deng bi tivingan dikeve û şer dest pê dike. De were binivîsîne...

Di vê zivistanê de, hevalên me bi çi dilî, bi çi cîgerê nobedariya van çîyan dikin û namûsa gel diparêzin? Meşa dirêj a di nava pêşîra vê zivistanê de, meşêke çawa ye...?!

Roj diqedin.

Meh derbas dibin.

Hinek diçin.. Hinek jî tên...

Lê belê tu caran şerê me naqede. Her ku diçe xurt dibe. Hevalên me, hem şehîd dikevin, hem jî dijîn. Ew piştî şehadetê, jiyane bi dest xwe ve tînin.

Gelo, kî dikare di nava hovîtiya vê zivistanê de bibe xwediyê jiyane? Belê, zivistan jî nikare şerê me bisekinîne. Şerê ku em tê de jiyana

xwe dibînin, tu caran bala xwe nade berf û baranan.

Pêlavên hevalên me tijî av dibin. Serma xwe diavêje nava hestiyên wan. Dibe wekî agirekî. Lê belê, ew agir piştî çend rojan dibe agirê jiyane. Me germ dike û gulên ku em ji bo azadiya xwe av didin, dipişkîvîne û dilê me dibe kenekî şîrîn. Em çi bikin? Qedera me ev e.

Em di zivistanan de jî li ser pozê çîyan disekinî û ji dîrokê re çend gotinên rast dibêjin. Ez bawer-nakim ku vê carê dîrok bikaribe me ji bîr bike. Ji ber yê ku dîrokê vê carê dinivîsîn em bi xwe ne, di nivîsandina dîroka me ya vê carê de, ji me bêhtir kesekî din nîn e.

Zivistan e. Serma heye.

Lê belê dilê me pir germ e.

Di dilê me de germahiya şoreşê heye.

Şoreş, ne di biharê de, di zivistanê de jî şoreş e. Niha jî, em ji hevalên xwe re yê ku di bin berf û baranê de ne, silav û hezkirinana dişînin.



# Ez tirko danaynim ser kurdo



**D**i sala 1988'an de li ser êrîşên gerîla, komara tirk çûn û hatina zozanan li koçeran qedexa kiribû. Bi bahaneyê ku koçer alîkariya gerîla dikirin.

Xalê Şîno yê koçer ku 65 salî bû, dema ku wê qerara dewletê dibihîze hêrs dibe û jê re dide çêran. Xalê Şîno, ne bi tirkî dizanî, ne jî leşkerî kiribû.

Di wê salê de komîserêk bi navê İlkey, ku kesekî nijadperest û faşîst bû li Cizîrê wezîfe dikir. Ew kes neyarê hemû nîrxên gelê kurd bû. Carcaran bi cilên xwe yê sîvîl li sûkê digeriya. Yê ku şal û şapik li xwe dikirin li wan gef dixwarin û digot:

- Cilên medeniyetê li xwe bikin.

Tam di wan rojan de bi êrîşa gerîla du polis tene kuştin. Komîser li ser kuştina wan polîsan dîn û har dibe. Bi cilên xwe yê sîvîl çeka xwe digire, li sûkê yê sîmbelê wan dirêj, yê şal û şapik û cilên leşkerî li wan, yê kefi li serê wan heye, dibin hedefa êrîşa komîsêr.

Xalê Şîno jî wê rojê derdikeve sûkê û digere. Şal û şapikê wî lê, kefi li serê wî pêçayî û gopale wî di dest de, hêdî hêdî dimeşe. Dema tê Çaryanê, ew jî dibe hedefa komîsêr.

Komîser bi hêrs destê xwe diavêje kefiya Xalê Şîno û tîne xwarê.

- Bu nedir ulan, yasak olduğunu bilmi-

yor musun? (Ev çi ye ulan, tu nizanî ku ew qedexa ye?)

Xalê Şîno radihêje gopale xwe, bilind dike û li peresiya komîsêr dide, komîser digire dirêjê erdê dike. Dibêje:

- Tu çi dibêjî kûçik kurê kûçikan?

Li ser vê rewşê polisên sîvîl, xwe diavêjin ser Xalê Şîno. Lê bi gopale xwe li polîsan dixwe. Di vê bûyerê de serê çar polîsan tê şikandin. Lê Xalê Şîno dibin diavêjin nezaretê. Li ser vê bûyerê qeymeqam diçe qereqolê. Xalê Şîno tînin pêşberî qeymeqam. Qeymeqam jî Xalê Şîno re wiha dibêje:

- Yaşlı bundan sonra bezin üzerine şapka giy. Şapka kanundur ulan hanzo!..

Xalê Şîno tiştêkî fêma nake û serê dihejîne. Li ser vê yekê, diçin wergerêkî tînin, da ku tirkî wergerîne kurdî. Ji Xalê Şîno re dibêje:

- Xalo dibêjin gerek e tu li ser kefiyê şewqê deynî, ji ber ku şewqe bi qanûnê derketiye.

Li ser vê yekê çavên Xalê Şîno sor dibin û bersiv dide wan:

- Kuro kerên kurê keran. Ez qet tirko datînim ser kurdo. Ez vê qanûnê nas nakim.

GURGÎN SÎPAN/  
GIRTÎGEHA UMRANIYÊYÊ

## BIXELAT...

## XAÇEPIRSA BIXELAT (50)

## XAÇEPIRSA

1	S	B	T	Ü	S
2	B	A	D	E	R
3	V	A	R	A	S
4	M	A	M	I	Z
5	L	A	Z	E	R
6	C	A	N	A	Z
7	S	R	O	O	P
8	K	O	S	Z	E
9	R	E	M	E	Z
10	U	M	I	T	A

### Bersiva Xaçepirsa 48'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 50'an pirtûka "Albert Camus" ya BIYANÎ ye.

**Albert Camus**


**BIYANÎ**

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 48'an, pirtûka Antoine de Saint-Exupéry "Mîrzayê Biçûk" qezenc kirine: Ümîhan Gül/ Stenbol, Dilber Gümüşsoy/ İzmir, Turan Can/ Agîrî, Mehmet Çelen/ Cûlemêrg, Sewda Dil/ Qers

Li rojhilat bajarek	Hestiyê kulîmekê	Diji girînê	Osmûnyûm	Rûbarek li Amerîkayê	Kesê ji Iranê
Ronekbîrêk (Wêne)	Notayek	Emrazekî birinê	Diravê Stûdî	Kar	
			3		
Bermali	1			Bajar	
Qertafeke pîrsê				Baneşane	5
	Normal, tenahi		Bi alamanî erê	Bûyin	
	Jinap		Bêkêmasî, tam	Notayek	
Xwarîna sereke			Madeyeke ku dihele		
Gihanekek			Bi soranî diçim		
	Nimûne, minak			Xerabeyek li Qersê	
	Kesê ji Rûsyayê			Dewleteke ciran	
Moşek					
Seqa, diji ko				Cedwelek	
	4	Sembola Neonê	Fektyekî havîni	2	
			Strwe		
Darek Cihê ku film lê tê listin					
				Sembola iyonê	

PEYVA VEŞARÎ







Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNİŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

Gerinendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên  
Nivîsaran  
(Yaza İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziye  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)

Nimînendeyê Giştî  
yê Ewrûpayê:  
Mazhar Günbat  
Suriye: Jan Dost  
Helim Yûsiv

Berlin:  
Silêman Sîdo  
49-30-69002695

Hannover:  
Selim Biçûk  
49-5721-81360

Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884

Bruksel:  
Medenî Ferho  
32-02-466037

Stockholm:  
Robin Rewşen  
46-8-7510564

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Cellê:  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36

## Bangawazî ji nivîskarên Kurdistanê re

Di van kawdanên cenga ku li ser hatiye ferzkirin de gelê kurdî stembar di delfiveyê ke herî berteng re derbas dibe. Digel wê yekê jî gelê me yê ku li ber xwe dide, bo tevaya cihanê, mûsir e li ser daxuyakirina hebûna xwe di hemû warên jiyane de.

Bi reneke mûsir û bi arameke mezin gelê kurd dixwaze di warê jiyane de sazî û komeleyên xwe yê demokratîk bi rêk û pêk bike.

Damezrandina PEN'a Kurd a ku ji layê delegeyên PEN'a cihanî ve bi şanazî pêşewaziya wê hate kirin, ji bo gelê kurd saziyeke manîdar e û ji bo tevaya nivîskarên kurd vekirî ye. Ji ber vê yekê; ji bo vê kongreya ku wê bê lidarxistin, ji her bîr û baweriyê nivîskarên kurd ên ku berhem dane, vexwandiyên ve kongreyê ne.

Li pêş ve ronahiyê, PEN'a kurd bi şingirtina xwe ya di nav komela PEN'a cihanî de (ku saziyeke cihê rêzgirtin û şanaziyê ye), hem ji bo pêşdebirina pişeyî, dan û standina pêzanînen zanistî, hem jî ji bo berdestkirina derfetên ragîndana daxwaza aştîyê ya gelê kurd û parastina mafê wî yê demokratîk û neteweyî rê vedike.

Wekî komîteya dem-demî ku ji layê Serokê PEN'a Kurd yê berê Dr. Huseyn Hebeş ve hatibûn destnîşankirin û ji layê endaman ve hatibûn herêkirin, ji bo destpêkirina Kongreya PEN'a Kurd me hemû şert pêk anîne.

Ev nivîskarên me yê ku di listeya xwarê de navê wan hatine destnîşankirin, hemû vewendiyên kongreyê ne. Belê ew nivîskarên ku navê wan nehatine nivîsin, yan jî hatine jibîrkirin, dikarin ji bo beşdarbûna kongreyê, bi riya faksê ku li xwarê me daye xuyakirin, serî li me bidin.

Digel rêzgirtina me  
Dr. Zerdest Haco, Haydar Işık  
Faksa peywendiyê:  
(D) 08141 94247  
Mêjû: 01.02.1997  
Cihê ku wê kongreya PEN'a  
Kurd lê bê kirin:  
Haus Der Kulturen Der Welt  
John-Foster-Dulles-Alle 10  
D-10557 Berlin/Almanya

- 1 Abbas M. Abbas
- 2 Ahmet Faqîr
- 3 Aksoy Gürdal
- 4 Aktaş Mehmet
- 5 Alakom Rohat
- 6 Alan Dilpak
- 7 Aldahody Dr. Zohdî
- 8 Aras Ahmet
- 9 Argal Hayrî
- 10 Aslan Günay
- 11 Astere Kemal
- 12 Aykoç F. Melîk
- 13 Aytar Osman
- 14 Aziz Namo
- 15 Ayhan Medeni
- 16 Baksî Mahmut
- 17 Barnas Rojen
- 18 Barnas Usso Bedran
- 19 Batur Rahmi
- 20 Bayrak Mehmet
- 21 Beşikçi İsmail
- 22 Bêkes Şerko
- 23 Bender Cemşid
- 24 Berekat Selim
- 25 Berwarî Hivî
- 26 Berz Koyo
- 27 Biçûk Selim
- 28 Bildirici Hasan
- 29 Bilgin M. Sıraç
- 30 Birim Dr. Şadîk
- 31 Biyanî Kerim
- 32 Botanî Sabrî
- 33 Bozarslan M. Emin
- 34 Bruinnessen Prof. Martin von
- 35 Bucak Yayla
- 36 Bucak Serhat
- 37 Bulut Faik
- 38 Bulut Selahattin
- 39 Borak Mustafa
- 40 Boynukara Cuma
- 41 Cafer Haci
- 42 Cefil Ordixan
- 43 Cefil Cefilê
- 44 Cewerî Firat
- 45 Cewo Ezizê
- 46 Cihanî Perwîz
- 47 Cizirî Şerefxan
- 48 Culemergî İhsan
- 49 Cevik Süleyman
- 50 Çelik Selahatin
- 51 Çeliker Dr. Celadet
- 52 Cem Munzur
- 53 Çamlıbel A.
- 54 Çiyayî Metin
- 55 Düzgün Mustafa
- 56 Dağlı Fayçal
- 57 Dara Dilbixwin
- 58 Demirkapı Dr. Rodî
- 59 Devran Hasan

- 60 Dihokî Xelîl
- 61 Doğanay Ezeli
- 62 Dost Jan
- 63 Duman Mehmet Ali
- 64 Durre Abdurrahman
- 65 Darrêz Memo
- 66 Ehmed İbrahim
- 67 Eçi İsmet
- 68 Epözdemir Bedirxan
- 69 Erdem Emine
- 70 Erdem Hüseyin
- 71 Espar J.
- 72 Fırat A. Melik
- 73 Farqînî Zana
- 74 Ferat Selim
- 75 Ferho Medenî
- 76 Ferho Derwêş
- 77 Fuat Kemal
- 78 Gülmüş Şükrü
- 79 Günbat Mazhar
- 80 Gündoğan Cemil
- 81 Güven S. İzzet
- 82 Göldaş İsmail
- 83 Habash Huseyn
- 84 Haco Dr. Zerdest
- 85 Han Ebuzer
- 86 Hasretyan Prof. M. A.
- 87 Hebib Bedran
- 88 Heyderî Cemşid
- 89 Husamî A. Kerîm
- 90 Huseyn sağmîç Feqî
- 91 Işık Haydar
- 92 İzgören A. Hicri
- 93 İzolî D.
- 94 Jandil Lerzan
- 95 Kızıllan İlhan
- 96 Kahraman Ahmet
- 97 Kara Sabah
- 98 Kara Mazhar
- 99 Kartal Hüseyin
- 100 Kaya Yaşar
- 101 Kaytan Hüseyin
- 102 Kemal Yaşar
- 103 Konuk A. Kadir
- 104 Kurdî Mahabad
- 105 Kutlay Naci
- 106 Kayan Zahir
- 107 Karadeniz Ali
- 108 Kışınak Gülten
- 109 Kızılkaya Muhsin
- 110 Laisser Sheri
- 111 Lewendî Mahmûd
- 112 Malmisanîj
- 113 Mayî Mahfûz
- 114 Mayî M. Nazîf
- 115 Mazhar Dr. Kemal
- 116 Metê Hesenê
- 117 Metiner Mehmet
- 118 Müller Arthur

- 119 Mîrawdelî Dr. Kemal
- 120 Mîrzengî Xurşîd
- 121 Mistefa Resûl Prof. İzedîn
- 122 Mizûrî Abdurrahman
- 123 Muştakhan Kaya
- 124 Mukriyanî Kurdistan
- 125 Mungan Murathan
- 126 Nazê Bavê
- 127 Nebez Dr. Cemal
- 128 Necip Balayî
- 129 Neqşibendî Abdurrahman
- 130 Nezan Kendal
- 131 Odabaşî Yılmaz
- 132 Okumuş Ömer
- 133 Okumuş Eşref
- 134 Omer Feryad Fazil
- 135 Öztimir Murat
- 136 Pêncewînî M. Emîn
- 137 Polat Edip
- 138 Polat Loqman
- 139 Qadîr Dr. Cebbar
- 140 Qazî Hesen
- 141 Reş Çerkezê
- 142 Reş Konê
- 143 Reşid Mustefa
- 144 Rizgar Baran
- 145 Samancı Suzan
- 146 Sarwat Alî
- 147 Sefkan H.
- 148 Sîdo Dr. Kemal
- 149 Soreklî Ş. Bekir
- 150 Şeko Dildar
- 151 Şahîn Beybanî
- 152 Şakilî Ferhat
- 153 Talabanî Dr. Muukerrem
- 154 Telek Nazîf
- 155 Tepe Prof. Reşîd
- 156 Tigrîs Amed
- 157 Topal Rıza
- 158 Torî
- 159 Tuku Ömer
- 160 Tan Sami
- 161 Tan Altan
- 162 Uzun Mehmet
- 163 Wanlî İsmet Şerîf
- 164 Keznedar Prof. Marûf
- 165 Xido Şakîrê
- 166 Yücel Müslüm
- 167 Yıldız Hasan
- 168 Yeşilgöz Yusuf
- 169 Yiğit Mîrhem
- 170 Yûsiv Henîf
- 171 Yûsiv Helim
- 172 Zana Mehdi
- 173 Zarakolu Ragîp
- 174 Zilan Reşo
- 175 Zinar Zeynelabidin



# Ji damezirandina saziyan bêtir lê xwedî derketin pêwist e

Kurd li her derê cihanê belav bûne, bi vê yekê re doza kurdan jî li seranserê cihanê belav dibe. Berî niha bi çendekî Seîd Mistefa ji Başûrê Biçûk ku niha li Avustralyayê dijî, bû mêvanê me. Me xwest li ser rewşa kurdên li wî welatî dûr, ew hinek agahiyan bide xwendevanên me. Wî jî bi dilxweşî bersiv da pirsên me. Ji gotinên wî tê fêmkirin ku kurdan li wî welatî hinek derfet bi dest xistine, ne li gorî daxwazê be jî hin gav avêtine.

**b**erî pêşin hûn xwe bi me bidin nasin, wekî kurdekî mihacr hûn li welatê xeribiyê çi kar û xebatê dikin. Têkiliyê we bi saziyên kurdan re hene, hebin bi çi awayî ne. Cihê ku hûn jê hatine saziyên kurdan di çi rewşê de ne bi çi awayî xebatê dikin û eleqeya gel bi saziyan re çi ye?

— Navê min Seîd Mistefa ye, ez jî Kurdistanî Biçûk im, min li wir zanîngehê beşa Ekonomiyê di sala 1985'an de qedand, di sala 1986'an de ez wekî muhacirê çûme Avustralyayê.

Beriya ku ez herim Avustralyayê Komeleya Kurdên Avustralyayê hebû, ev komale di Gulana sala 1979'an de ava bûbû û gelek xebatên balkêş, heja pêk anîne. Dûv re di nav demê de ji çar parçeyên Kurdistanê kurd hatin û bi kêmasî jî Ewropayê û raman jî pir bûn, îcar me biryareke din stand ku komeleyeke din were damezirandin, ev komale jî di sala 1987'an de bi navê "Komeleya Demokratîk a Kurdên Avustralyayê" û "Komeleya Kurdên Avustralyayê" ev her du komale hatin damezirandin û bi awayekî fermî xebatên xwe kirin.

Pişt re komeleyên din hatin damezirandin, wekî Komîteyeye Penehendeya Kurdên Başûr ev bi taybetî jî bo ku kar û barê Kurdên Başûr bîne cih, hate damezirandin.

Li gorî rewşê hevalên welatparêz dîtin ku parçebûna civaka kurd tu sûdnade civakê û Komeleya Kurdên Nîsazûs li gel komîteya Penehendana Komeleya Kurdên Sydney komeleyeke nû ava kirin di sala 1991'ê de.

Bi kurtasî komeleyên ku li wê derê tene naskirin, Komala Kurdên Avustralyayê û Komeleya Kurdên Nîsazûs in, ev her du komale li ba hikûmeta Avustralyayê fermî tene qebûl kirin.

Vanv saziyan çalakiyên wekî konser, meş, xwepêşdan li dar xistine, serî li rayedarên Avustralyayê dane ji bo ku wan li ser kêşaya kurdî agahdar bikin. Bo nimûne gelek stranbêjên wekî Şi-

van Perwer, Nasir Rezazî, Nizamettin Ariç û hwd. li wî welatî konser dane.

Îcar me kar û xebatên xwe wekî rêxistineke siyasî nikaribû bida xuyakirin, ji ber ku hikûmeta Avustralyayê jî pê kêfxweş nedibû. Avustralya naxwaze tu rêxistinên siyasî werine holê, ew komele divên, komele jî li gorî ku em rêbazên komalê hazir dikin ew wê rêbazê dipejirînin, dibe rêxistineke resmî li ba hikûmeta Avustralyayê.

Ez bibêjim cara yekemîn bû li Avustralyayê Enstîtuya Kurdî hate damezirandin. Damezirandina wê Enstîtuyê bi taybetî hevlekî ji Başûr bi navê Husên Sîncarî ku ew berpirsekî Bereya Kurdistanê bû, çêbû. Wê demê jî navê kurdan li dinyayê belav bûbû ku zêdetirî du milyon nîv kurdî koç kiribûn. Wî hevalî jî bo kurdên derve pêwistiya enstîtuyê destnîşan kir. Yanê wekî rêxistineke akademîk, lêkolînî karê bêtir balkêş bide xuyakirin, yanê karê xwe yê cihê jî komeleyan. Me jî pêşniyazên wî hevalî qebûl kirin. Di sala 1991'ê de li Sydneyê bi 19 kesan enstîtu hate damezirandin.

Bi rastî dema ku fikra enstîtuyê hate holê, enstîtu wekî sefareteke, dewletekê dihat hesibandin. Îro welatê me tune lê em dikarin wekî sefaretê xwe li deveran damezirînin. Enstîtu dikare berpirsiya Kurdistanê û di eynî wextê de berpirsiya civaka kurdên Avustralyayê bike.

Gerek Enstîtu wek rêxistineke akademîk bûya, em bêjin hikûmeta Avustralyayê kesên ji derve werin çi înfomasyon li ser kurdan bixwazin hemû tiştî em bêjin di warê rêxistinî de di warê dîrokê de di warê siyasî, tendûristî de çi xebata li ser civaka kurdên li Avustralyayê li ser welatê gerek em bikaribin wî tiştî pêşkêş bikin.

Û gereke rojname, berhem derkevin. Me bi vê armançê enstîtu ava kir, lê mîxabin, ew tiştê ku me daxwaz dikir nehatine cih. Ji bo vê yekê gelek problem di navbera endamên enstîtuyê de derketin, hinek jî endamên enstîtuyê dix-



westin enstîtuyê jî bo menfeatên xwe yê aborî bikar bînin. Ez dikarim vekirî bibêjim zêdetirî 110 hezar dolar ji hikûmeta Avustralyayê alîkarî girt, lê ez bi xwe cigirê jimêryar im haya min jî tu çalakiyan tune, ez nizanîm ew 110 hezar li ku xerc bûn. Me serî li Avustralyayê Instute in Comision xist, me da xuyakirin ku ew aboriya ku me ji hikûmetê standibû pak bi kar neaniye, em dixwazin ew tişt were sekinandin. Di vê encamê de enstîtuyê tu karekî balkêş nekir.

Me rojnamek derxist nîve nîv bû, ne karekî qenc bû, lê pêwistiya civakê bi rojnameke hefteyî an du hefteya derkeve heye. Xeberên civaka kurd xeberê welêt, nîvî kurdî, nîvî îngilîzî wê tiştêkî baş bûya. Lê ew kêmasiya me bû û kêmasiya gelek hevalên li wê derê ye jî, diherin li malê xwe rûdinin ji civakê gelek aciz bûn, ew tişt jî xesareta welatê me ye.

Lê heval dixwazin kongreyê çêbikin, bangî hevalên zana, rewşenbîr, entelektuel bikin da ku em careke din xwîneke nû bidin enstîtuyê.

Dema ku enstîtu damezirandin endamê Enstîtuyê yê şerêfê jî wezîrê cigirê karê hindur ê Avustralyayê Gerry Hand bi xwe serî li me da, bû endamê enstîtuyê, lê civaka me layiqê wê meselê derneket, ew enstîtu birêve nebîr.

Di wî warî de bibêjim tiştêkî dîsîplînî tune, hin hevalan li wê derê dibista-

neke kurdî vekirine, ew jî ji hêla komeleya Kurdên Avustralyayê ve organize dibe, dawiya hefteyê de roja yekşemê jî bo zarokan û mezinan perwerdehiya bi zimanê kurdî tê pêşkêşkirin û bi awayekî pir pêş ketiye. Di warê çand û hunerê de grûbên muzîkê yê zarokan û hunermend jî hene, ew kar di komeleyan de dibin û berhemên komeleyan jî hene wekî belavokan derdixin.

Hikûmeta Avustralyayê maf daye kurdan ku di hefteyê de saetekê wekî hemû etnikê din ji radyoya resmî îstifade bike.

Belê têkiliyên me ligel rêxistinên kurd yê Ewropa re hene; çî li Almanayayê, çî li Swêdê rojnameyên wan digihîjine me, tiştê ku em ji wan re digihîjine hene. Wekî em bibêjin rojnameyê wekî Azadiya Welat digihîje destê hevalan. Ez dikarim bibêjim kêmasiya komeleyan e ku gelek komele vê rojname nagirin, pêwist e vê rojnameyê bigirin li hevalên xwe belav bikin. Lê rojname bi endamtiya hin kesan digihîje Sydney û rojname ji Swêdê, ji Almanayayê digihîjine me.

Belê rojnameya Azadiya Welat jî digihîje me. Azadiya Welat serbilindiya mezin e ji bo gelê kurd, îro rojnameyê wisa bi zimanekî paqij li Kurdistanê Bakur dertê. Alem û dinya dizane rewş li vir çiqas xerab e, lê tevî vê xerabiyê jî ev rojname tê çapkirin.

AMADEKAR: METİN AKSOY